

19


ISSN: 2147-5679
Cilt/Volume: 10
Sayı/Issue: 19
Yıl/Year: 2024



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

BUYDED

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ • BINGOL UNIVERSITY JOURNAL OF LIVING LANGUAGES INSTITUTE



Hasan FİLİTOĞLU

**Folklor: Lêkolînek li ser Pênase, Pêşketin
û Têkilîya wê bi Modernîteyê re**

İlyas SAYIM • M. Zahir ERTEKİN
**Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî
û Hin Taybetmendiye Wê**

Muhammed İkbâl DENİZ • Hemin OMAR AHMAD
**Kêş di Stranên Dilankî yên Kurmancî de
Destxetên Mela Xelefê Bafî Weke Nimûne**

Hasan ÇİFTÇİ

**Ortak Atasözlerin Hikâyeleri:
Kör baykuşun kısmeti.../
Rizqê gurê kor.../
Rizq vêrg kor... /
Fârsça-Kurmancî-Zazakî-Türkçe 13**

Fırat ATILGAN • Fatoş ARSLAN • Hakan ÇELİK
**Ji Bo Lêkolînên Kurdolojîyê
Bibliyografyaya Tezên Ziman
Û Çand/Edebiyata Kurdî (2020-2023)**



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
BUYDED

Yıl/Year: 2024 Cilt/Volume: 10 Sayı/Issue:19

ISSN: 2147-5679

Sahibi Owner

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına
Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Editör Editor

Doç. Dr. Üyesi Zafer AÇAR

Editör Kurulu Editorial Board

Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY
Dr. Öğr. Üyesi Muhammed Bilal TOLAN
Dr. Öğr. Üyesi İbrahim DAĞILMA
Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD
Dr. Öğr. Üyesi Ömer DELİKAYA
Arş. Gör. Adnan AYDINTÜRK
Arş. Gör. Buşra Aslan BAYNAL
Arş. Gör. Hacı İbrahim AYTEKİN

Dergi Sekreteryası ve İletişim Secretary of Journal and Communication

Enstitü Sekreteri Sadrettin BEKİ

Dergi Yazışma Adresi Correspondence Address

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü, 12100-Bingöl
Telefon: 0426 216 00 42 • Faks: 0426 216 00 42
Dergi e-posta: buyded@bingol.edu.tr
Enstitü e-posta: bingolyasayandiller@gmail.com

Dergi Tasarım ve Uygulama Magazine Design

Ridwan Xelil



Dergimizde yayınlanan makaleler Turnitin intihal programından geçtikten sonra yayınlanmaktadır.

Dergimizin tarandığı dizinler:



Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi yılda 2 kez yayımlanan, uluslararası hakemli akademik bir dergidir. Yayımlanan yazıların her türlü hukukî ve bilimsel sorumluluğu yazarlarına aittir. Derginin her hakkı saklıdır. Dergide yayımlanan yazılar kaynak gösterilmeksizin kullanılamaz.

Yayın Kurulu ve Danışma Kurulu *Editorial Board and Advisory Board*

Prof. Dr. Abdulaziz HATİP, Marmara Üniversitesi	Prof. Dr. Yadgar Rasool, Selaheddin University, Iraq
Prof. Dr. Abdullah KIRAN, Muş Alparslan Üniversitesi	Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Abdullah ÖNALAN, Siirt Üniversitesi	Prof. Dr. Vecihi SÖNMEZ, Batman Üniversitesi
Prof. Dr. Celilê Celil, Instut für Kurdologie, Awisturya	Prof. Dr. Abdulcebbar KAVAK, Karabük Üniversitesi
Prof. Dr. Edip ÇAĞMAR, Dicle Üniversitesi	Prof. Dr. Abdülhadi TİMURTAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi	Prof. Dr. Hayrettin KIZIL, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Ahmet KAYINTU, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ, Dicle Üniversitesi	Doç. Dr. Canser KARDAŞ, Muş Alparslan Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BARCA, Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi	Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BİLEN, Dicle Üniversitesi	Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN, Muş Alparslan Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet Mahfuz SÖYLEMEZ, İstanbul Üniversitesi	Doç. Dr. İbrahim USTA, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Metin YİĞİT, Dicle Üniversitesi	Doç. Dr. Üyesi Mustafa ASLAN, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Mustafa AGAH, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Mehmet YAZICI, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Mychael CHYET, Washington Library, USA	Doç. Dr. Mustafa GÜNERİGÖK, Sakarya Üniversitesi
Prof. Dr. Nesim DORU, Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi	Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Prof. Dr. Orhan BAŞARAN, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Yusuf AYDOĞDU, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Salih AKIN, Rouen University, France	Dr. Öğr. Üyesi Asoss M. Qader, Lehrstuhl für Altorientalistik, Universität Würzburg, Almanya
Prof. Dr. Seyid Ahmed PARSA, Kurdistan University, İran	Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD, Bingöl Üniversitesi

Bu Sayının Hakemleri *Reviewers of the This Issue*

Doç. Dr. İlyas AKMAN

Doç. Dr. Mehmet Emin BARS

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

Dr. Öğr. Üyesi. İlyas ARSLAN

Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YAKIŞIK

Dr. Öğr. Üyesi Selman YEŞİL

Dr. Öğr. Üyesi Semih GEZER

Dr. Öğr. Gör. Ayhan YILDIZ

Dr. Hikmettin ATLI

Dr. Ramazan PERTEV

Dr. Türkan TOSUN

Dr. Resul GEYİK

Dr. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR

Düzelme *Repair*

Dergimizin 17. Sayısında yazısı bulunan yazarımız Buşra Aslan Baynal'ın ismi yazının bulunduğu sayfada sehven Büşra Aslan Banyal şeklinde çıkmıştır.

Dergimizin 18. sayısında yayımlanmış olan Müslîh Sezer ve M. Zahir Ertekin'e ait "Qewm, Welat û Bajar di Dîwana Melayê Cizîrî da" adlı makale Müslîh Sezer'in doktora tezinden üretilerek hazırlanmıştır.

İÇİNDEKİLER CONTENT

Hasan FİLİTOĞLU

**Folklor: Lêkolînek li ser Pênase, Pêşketin
û Têkilîya wê bi Modernîteyê re**
7-15

İlyas SAYIM • M. Zahir ERTEKİN
**Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî
û Hin Taybetmendiye Wê**
16-31

Muhammed İkbâl DENİZ • Hemin OMAR AHMAD
**Kêş di Stranên Dîlankî yê Kurmancî de
Destxetên Mela Xelefê Bafî Weke Nimûne**
32-53

Hasan ÇİFTÇİ
**Ortak Atasözlerin Hikâyeleri:
Kör baykuşun kısmeti.../Rizqê gurê kor.../ Rizq vêrg kor...
Fârsça-Kurmancî-Zazakî-Türkçe 13**
54-86

Firat ATILGAN • Fatoş ARSLAN • Hakan ÇELİK
**Ji Bo Lêkolînên Kurdolojîyê Bîbliyografyaya Tezên Ziman
Û Çand/Edebiyata Kurdî (2020-2023)**
87-98

Folklor: Lêkolînek li ser Pênase, Pêşketin û Têkilîya wê bi Modernîteyê re

Kurte

Ev gotar behsa pênasekirin, geşepêdan û pêwendîya folklorê bi modernîteyê re dike. Her çiqas folklor bi çanda civakê re girêdayî ye û cureyên vegotinên gelêrî yên wekî çirok, stran, gotinên pêşîyan, nifir û yên din di nava xwe de dihevine jî, di heman demê de gîyanê miletekî jî îfade dike. Lewre bandora folklorê li ser çanda civakê kûr û cihêreng e. Ew bi guhertina şert û mercên civakî re kirasên xwe diguherîne û bi demê re xwe diguncîne.

Pêvajoyên dîrokî yên ku di tevahiya gotarê de hatine vekolîn nîşan didin folklor diyardeyek qewiye û ji ber faktorên wekî nûjenbûn, konjektürel û danüstendinên di nava gelên ji hev cûda de, pêşketiye û guheriye.

Ev gotar tevî ku analîz û pênaseyên der barê folklorê de bihev tof kirîye, balê dikşîne ser wê yekê ku ka folklor di dewrana dîrokê de çawa guherîye, wê bandoreke çawa li modernîteyê kirîye û di çarçoveya çandî de cihê xwe bi çi awayî dihevine.

Bêjeyên Sereke: Folklor, Edebîyata Gelêrî, Zanista Civakî, Îdeolojîya Neteweyî, Hûnera Devkî

Folklor: Tanım, Gelişim ve Moderniteyle İlişkisi Üzerine Bir İnceleme

Özet

Bu makalede folklorun tanımı, gelişimi ve modernite ile bağlantısı ele alınmaktadır. Folklor, toplumun kültürüyle ilgili olup hikâye, şarkı, atasözleri, beddualar vb. içermesinin yanı sıra aynı zamanda bir milletin ruhunu da ifade eder. Çünkü folklorun toplum kültürü üzerindeki etkisi derin ve çeşitlidir. Toplumsal koşulların değişmesiyle birlikte folklor kıyafetlerini de değiştirir ve zamanla uyum sağlar.

Makale boyunca analiz edilen tarihsel süreçler, folklorun dinamik bir olgu olduğunu ve modernleşme, konjonktürel ve farklı halklar arasındaki etkileşim gibi faktörlere bağlı olarak gelişip değiştiğini göstermektedir.

Bu makale, folklorun analiz ve tanımları ile birlikte, folklorun tarihin akışı içinde nasıl değiştiğine, moderniteyi nasıl etkilediğine ve kültürel bağlamda nasıl kendine yer bulduğuna dikkat çekmektedir.

Anahtar kelimeler: Folklor, Halk Edebiyatı, Toplum Bilimi, Millî İdeoloji, Sözlü Sanat



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year: 2024 • Cilt/Volume: 10 • Sayı/Issue:19

Hasan FİLİTOĞLU

Xwendekarê Mastirê, Rouen University

hasanfilitoglu@gmail.com

Orcid: 0000-0002-4230-3056

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 27.10.2023

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 25.01.2024

Makale Yayın Tarihi / Published: 28.06.2024

DOI: 10.56491/buydd.1382189

Atıf / Citation:

FİLİTOĞLU, H. (2024). Folklor: Lêkolînek li ser Pênase, Pêşketin û Têkilîya wê bi Modernîteyê re, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 10(19), 7-15

Folklore: A Review on Definition, Development and its Relationship with Modernity

Abstract

This article deals with the definition of folklore, its development, and its connection with modernity. Folklore is related to the culture of a society; in addition to containing stories, songs, proverbs, curses, and the like, it also expresses the soul of a nation. Because folklore influences the culture of society, it is deep and diverse. With the changes of social conditions, folklore also changes its clothes and adapts over time.

The historical processes analysed throughout the article show that folklore is a dynamic phenomenon, evolving and changing depending on factors such as modernization, conjuncture and interaction between different peoples.

This article, together with analyses and definitions of folklore, draws attention to how folklore has changed in the course of history, how it has affected modernity and how it has found its place in the cultural context.

Key Words: Folklore, Folk Literature, Social Science, National Ideology, Oral Art

Destpêk

Ji serdemên berê heya niha folklor bûye yek ji diyardeyê mihîm ê civakê. Ji berê ve mirov jîyana xwe li gor hin qaîdeyan bi rê ve dibin. Ev qaîde û edetên mirovan bi demê re kirasekî neteweyî û rûhekî manewî hildidin ser xwe û wek beşeke girîng ê civakê tên qebûl kirin. Lê helbet ji ber kevnarbûn û xwenûkirina xwe folklor, li gorî serdeman bi wateyên cuda hatiye bikaranîn û pênasekirin. Her çiqas paşxaneya hêmanên folklorê heya demên kevin dirêj bibe jî, binavkirina wê ya bi navê ‘folklor’ê xwe digihîne du sedsal berê.

“Folklor cara yekem wek peyv ji aliyê lêkolînerê Brîtanî, William John Thoms ve ji dêvla kevnarên populêr hatîye bikaranîn û ketîye nav civaka zanistê.”¹ Wek serkêşê vê zanistê John Thoms, piştî ku gotara xwe belav dike, bandoreke mezin li ser cîhanê dike û pê re jî li her derên dinyayê, xebatên folklorê geş dibin. Di serî de xebatên ku li ser folklorê hatine kirin ji naskirina folklorê, naverok û têkilîyên wê pêk tên.

Ji ber nezelalbûna qad û sinorên folklorê hin gengeşî derdikevin holê. Li ser naverok, sînor, peydabûna wê û her wiha diyarkirina çarçoveyê geştî teorîsyen, bi awayekî qethî li hev nakin lê bi gelemperî heman tiştî vedibêjin. Lê ji ber qada xwe ya xweser û dewlemend ji kesên cuda angaşten cîyawaz derdikevin holê.

Di tesbîtkirina folklorê de pirsgirêka sereke diyarkirin sînorên wê ye. Berîya gotara John Thoms belav bibe, li Elmanyayê ji dêvla “Folklor”ê peyva “Wolkskunde” dihat bikaranîn. Ev peyv ji bo xebatên Elmanyayê dihate wateya lêkolîna li ser gundî û gundewaran. Loma jî xebatên destpêkê bi gund û jîyana gundîyan re sînor darkirî bû. Lê dema ku folklorê bala Amerîkanîyan kişand, hingê naverok, sînor û pênaseya wê jî di cîh de guherî. Lewra li Amerîkayê di navbera gundîyan de ferq an jî çîn tune bû.² Kesên ku di qada folklorê de dixebitîn li gor çavderiyên xwe tehlîl û dahûrandin dikirin. Her yek ji wan teoriyan hem rola folklorê ji nû ve diyar kirin, hem jî bandor û sehaya wê ya tehlîlê fireh kirin. Ev jî bû sedem ku ji aliyê teorîsyenan ve folklor ji nû ve hate xwendin.

1. Pênaseya Folklorê

Li gorî Yuri M. Sokolov folklor ji keresteyên civakê pêk tê û bi lêkolîna keresteyan re jî zanista folklorê ava dibe. Her wiha wekî ku ji etîmolojiya wê jî diyar e, folk (gel) û lore (zanist) tê wateya zanista gel.³ Dîyar e ku Sokolov ji aliyê etîmolojiyê ve jî peyva folklorê dinirxîne. Loma jî tevî ku zanistbûna folklorê dipejirîne, pênaseya folklorê bi têgeha gel jî rave dike.

Alan Dundes di wê bawerîyê de ye ku folklor berîya her tiştî zanistek e û her wiha bi pêkhatiyên jîyanê yê

1 Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê yê Îroyîn*, Wer. Necat Keskin, Weşanxaneya Avesta, Istanbul, 2017, r. 7

2 Francis Le Utley, “Folklorun Tanımı”, *Kovara Milli Folklor*, Wer. Saltık Özkan, 2005, h. 65, r. 131

3 Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Wer. Yekê Özer, Weşanxaneya Geleneksel, Ankara, 2009, r. 11-12

wek rabûn û rûniştin, çand, wêje, cil û berg, edet û tore, mezinkirina zarokan û heya avakirina hişmendîya kesayetîyê re jî têkildar e.⁴ Xuya ye nêrîna Dundes û Sokolov di derbarê folklorê de ji gelek alîyan ve nêzî hev e. Her du jî folklorê wek zanist qebûl dikin û têkilîya wê ya bi jîyanê re derdixin pêş.

Bi awayekî giştî di van nêrînan de keda gel derdikeve pêş. Loma jî xebatên ku bi navê folklorê hatine kirin wek xebatên zanîna gel jî tên qebûl kirin.

Herder ku yek ji teorîsyenê folklorê yê herî bi nav û deng e û bi fikrên xwe di xebatên folklorê de nêrînen nû vedike, folklorê wek edetên xelkê binav dike.⁵ Lê Bascom, di wê fikrê de ye ku folklor her çiqas wek edetên xelkê û zanista xelkê bê qebûl kirin jî bi temamî ne rast e. Ji ber ku keresteyên folklorê ji edetan zêdetir xwedîyê hunerekê ne jî. Loma jî ji folklorê re dibêje ‘*hunera devkî*’. Bascom, hunera devkî wek beşeke folklorê dibîne û tevî vê yekê folklorê wek zanîna xelkê jî qebûl dike. Li gor wî efsane, ne tenê zanîn in, li gel vê hunereke mezin in jî. Loma jî binavkirina folklorê nikare bi tenê edet û zanîna xelkê re bê sîno darkirin.⁶ Bi vî awayî balê dikêşîne ser avakirina paşxaneya çîrok, stran, efsaneyan û hunera gel derdixe pêş. Bi vê fikra xwe ve Bascom folklorê ne tenê wek kevneşop, wek hunereke serbixwe jî qebûl dike.

Hinek teorîsyen ji alîyê kevnbûnê ve li folklorê hûr dibin. Yek ji wan John Thoms e ku di gotareke xwe de folklorê wek mehsûlên demên kevn mîna kevneşop, gotinên pêşîyan, tevgerên xelkê û hwd. îfade dike.⁷ Her çiqas vê pênaseyê rêya xebatên folklorê ronî kiribe jî di heman demê de hin pirsgerêk jî bi xwe re derxistîye holê. Lewra li gor vê pênaseyê folklor tiştên kevn in û tenê aîdê demên borî ne. Wek William Bascom gelek folkloran li hember vê fikrê derketine û hin tişt lê zêde kirine. Lewra li gor Bascom, pênasekirina folklorê ya ‘folklor kevnarebûn e’, neheqîyê li stran, listik, henek, jest û mîmikên îroyîn jî dike. Her wiha ev pênase afirîneriya gelan jî tune dihesibîne. Loma jî ev fikr bi giştî ne rast e.⁸

Çawa ku hin teorîsyenan folklor wek kevnare, hinan jî wek huner qebûl kirine, hinekan jî di vê qadê de gaveke din jî pêş de çûne û folklorê wek wêje qebûl kirine. Le Utley, folklorê mîna wêjeya bi devkî hatîye neqil kirin qebûl dike.⁹ Lê belê folklorê tenê bi wêjeya devkî sîno dar nake û festîval, çand, mîhrîcan û hwd jî di nava folklorê de bi cih dike.¹⁰

Bi awayekî akademîk xebatên folklorê û wek zanist bikaranîna wê di nava Tirkîyê de li gor Ewropayê dereng dest pê kirîye. Di van nivîsan de folklor bi gelemperî wek ‘zanista xelkê’ û ‘xelqîyat’ wekî tiştên ku xelkê afirandîye hatine binav kirin.

Teorîsyen Örnek, folklorê wek zanista xelkê qebûl dike. Li gor Örnek zanista xelqê bi rê û rebazên teknîkî li ser çanda gelekî an jî herêmekê lêkolînan dike, hêmanên çandê berhev dike, tîne beranberî hev, li ser wan şiroveyan pêşkêş dike û di dawîyê de jî bi wan re digihêje encamekê û sentezeke nû çê dike.¹¹ Örnek jî wek ên pêşîya xwe folklorê, zanisteke xwedîyê rê û rebazên teknîkî dihesibîne û lê zêde dike, lêkolînen li ser folklorê dê bîn kirin divê li gor qaîdeyên zanistî bin.

Seyah ew kes in ku yekem nimûneyên folklorîk di berhemên xwe de dihewînin. Ev kesana li kîjan welatî ewirîne û lê derbas bûne, di seyahatnameyên xwe de behsa wan welatan, folkloran wan kirine û li ser wan agahî dane. Îja ji ber ku li ser erdnîgarîya kurdan rêyên bazirganîyê zehf bûn, em di nav berhemên wan seyahana de, di derbarê kurdan de gelek tiştan hîn dibin. Kitêbên seyahên mîna Îbnu Batûta û Ewliya Çelebî ji bo van gotinan du palpiştên herî xurt û navdar in.

Berhemên seyahana ji berhevkarîya hemanên folklorîk zêdetir li ser danasîna welatan bûn. Jixwe wê çaxê, berhevkarîya hêmanên folklorîk jî zêde xurt nebû. Piştî sedsala 19’an, bi şoreş û înzilaban re xema berhevkarîya

4 Alan Dundes, *Folklor Nedir; Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 2*, Wer. M. Öcal OĞUZ-Selcan GÜRÇAYIR, Weşanxaneya Geleneksel, Ankara 2010, r. 15-18

5 Remezan Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman-*, Weşanxaneya Peywend, İstanbul 2013, r. 31

6 William Bascom, “Halkbilimi, Sözlü Sanat ve Kültür” *Kovara Milli Folklor*, Wer. Nilgün Aytuzlar, s. 2004, h. 63, r. 88-89

7 Süheyla Sarıtaş, “Halk Bilimine Giriş”, www.acikders.org.tr/pluginfile.php/2512/mod_resource/content/2/Hafta_3.pdf, 13.12.2018

8 William Bascom, “Halkbilimi, Sözlü Sanat ve Kültür” *Kovara Milli Folklor*, Wer. Nilgün Aytuzlar, s. 2004, h. 63, r. 89

9 Francis Le Utley, “Folklorun Tanımı”, *Kovara Milli Folklor*, Wer. Saltık Özkan, s. 2005, h. 65, r. 135

10 H.b.r, r. 136

11 Sedat Veyis Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneya İş Bankası, Ankara 1977, r. 15

hêmanên folklorîk di nav xelqê de peyda dibe. Her çiqas berîya Bazîdî jî hîn nimûneyên xebatên folklorîk li ser folklorê kurdî hebin jî, ji aliyê berhevkarî û tomarkirinê ve, xebata herî berfireh di salên 1850î de ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) hatîye kirin.¹²

Piştî yekem xebatên bi vî şiklî, bi awayekî xurt ferq kirin û xwedî derketina folklorê bi rêya kovar û rojnameyan ve xwe nîşan dide. Di rojname û kovarên kurdî de cih ji nivîsên folklorîk ve tê veqetandin û heta Celadet Alî Bedirxan ji xelqê dixwaze ku bila her kes nivîsên di derbarê folklorê de ji wan re bişîne.¹³

Ji ber ku kurd erdnîgarîyek mezin de berbelav in, hêmanên folklorîk li gor dever û herêman tîn guhertin û navên cuda lê tîn dayîn. Di kurdî de ji bo peyva folklorê gelek nav hene. “Bi kurdî bêjeya folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel.”¹⁴ Li gorî Celadet Elî Bedirxan “folklor, zanîn an zanista xelkê ye.”¹⁵ Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî “zargotin” û “zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi zazakî “zanista şarî” tê gotin.¹⁶

Xuya ye ku binavkirina têgeha folklorê di kurdî de bi giştî di bin karîgerîya peyva ‘folklorê’ de maye. Lê kesên wekî Celadet, pêşdetir çûne û tevî zanistê, zanîna gel jî li folklorê zêde kirine. Bi vî awayî feraset û qabîliyeta gel bêhtir hatîye destnîşankirin.

Der heqê peyva folklorê de, di kovara *Hawarê* de bi sernavê “ferhengvan” wiha hatîye gotin “Ev bêje di eslê xwe de inglîzî ye. Lê îro ketîye hemî zimanên dinyayê. Lewra me jî ew xistîye zimanê xwe. Ji xwe kurdên Qafqasyayê berîya me ev bêje xistine zimanê me û kitêbeke bi navê “folklorê kurdmançî” belav kirine.”¹⁷

Di çarçoveya van fikr û pênaseyan de bi giştî em dikarin bibêjin; yekemîn qonaxa peydabûna folklorê bi awayekê qethî nayê zanîn. Jiyan û tevgerên mirovahiyê bi demê re dikevin formekê û ji aliyê gel ve xwedî li wan tê derketin.; hinek ji wan bi devkî hatine parastin, hinek jî ji wan bi tevgeran hatine vehandin, paşê jî bi saya guhdarvanan û şopgeran nîş bi nîş heta van rojan hatîye vegûhastin ku niha em wan wek folklor bi nav dikin.

1.1. Naveroka Folklorê

Folklor tevî ku zanîna gel e, di heman demê de motîfên çandî û netewî di hundirê xwe de dihewîne. Her wiha hemû hebûn û tunebûnên berdest re jî têkildar e û li ser pirsên wekî; mirovên berê debara xwe çawa dikirin, dema birçî dibûn çî dixwarin, çawa rudiniştin, dawetên wan çawa bûn, di şahî û şînan de kirasên wan çawa bûn û wd. radiweste. Ev tiştên ku em niha di jîyana xwe de mîna tiştên kevn binav dikin, di demên berê de wateyên wan ên kûrtir jî hebûn. Lê niha tenê wekî kevnevedî tîn zanîn.

Li gorî Celadet Elî Bedirxan “folklor tevayî adet, çîrok û stranên mîletekî ne, ew adet, çîrok û stranên ku ji nav xelkê der ketine û ketine ser hev, gihaştine nîşên nû.”¹⁸ Wekî ku xûya dike Celadet Elî Bedirxan di nîrxandina peyva folklorê de karîgerîya mîlet û xelqê derdixe pêş.

Vladimir Propp, di kitêba xwe ya bi navê “Folklor, Teorî û Dîrok”ê de naveroka folklorê bi hemû afirinerîya gelan ve îfade dike.¹⁹ Propp di wê bawerîyê de ye ku her tiştê ku ji aliyê gel ve hatîye afirandin, çî xwarin be û çî jî cil û berg be hemû dikevin naveroka folklorê.

Francis Le Utrey her çiqas folklorê weke wêjeya bi devkî hatîye neqilîkirin qebûl dike jî lê naveroka folklorê bi neqilîkirina wê ya bi devkî sînodar nake û bawerî û tevgerên gelan jî di naveroka folklorê de rave dike. Çîrok, stranên gel, henek, çîrokên ajalan, balad, helbestên gel, mît, bawerîyên gel, sêhr, gotinên pêşîyan, mamik, lorî,

12 Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanxaneya Avesta, 2018, Îstanbul, r.136

13 Celadet Alî Bedirxan, “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê” *Kovara Hawar*, j:1, Şam, 1923, r.1

14 Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanxaneya Avesta, Îstanbul 2018, r. 27

15 Celadet Alî Bedirxan, “Ferhengok”, *Kovara Hawar* j. 30, Şam 1941, r.749

16 Yıldırım Kadri / Pertev Ramazan, / Aslan Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneya Zanîngeha Mardin, Îstanbul, 2013, r.11

17 Celadet Elî Bedirxan, “Ferhengvan”, *Hawar*, hej.30, r. 8

18 H.b.r, r. 25

19 Vladimir Propp, *Folklor, Teorî ve Tarih*, Wer. Necdet Hasgöl - Tolga Tanyel, Weşanxaneya Avesta, Stenbol 1998, r. 11

mîhrîcan û şahîyan hemûyan jî di nava folklorê de îfade dike.²⁰

Zîya Gökalp folklorê wek çandê menewî dihesibîne û balê dikşîne li ser vegûhestina folklorê devkî. Li gor Gökalp gotinên pêşîyan, biwêj, edet û tore, stran û wd. bi rêya devkî gihaştîye îro. Loma jî Gökalp îdia dike ku folklor ji nivîsê wêdetir bi çanda devkî re eleqedar e.²¹

M. Fuat Köprülü di derbarê naveroka folklorê de dibêje her tiştê aîdê gel folklor e. Stran, çîrok, gotinên pêşîyan û destan ji ber ku rewşa rûhîyeta gelan vedibêjin, hemû jî dibin folklor.²²

Li gor Pertev Naili Boratav, folklor nêrîna civakê ya li hemberî jîyanê ye. Loma jî edet, tore û hemû hêmanên çandî yên civatê lêkolîn dike.²³ Her wiha Boratav bi xebatên xwe ve balê dikşîne ser neteweyîbûna folklorê û naveroka folklorê jî bi hêmanên çandî yên civatê rave dike.

Her çiqas çanda devkî beşeke girîng a folklorê be jî, bi temamî nikare folklorê rave bike. Lewra li gor Gökalp tiştên ku folklorê ava dikin ragihandina wan a devkî ye. Lê belê Alan Dundes di gotara xwe ya bi navê “Folklor Çi ye?” de amaje dike ku folklor tenê nikare bi çanda devkî bê îfadekirin, ji ber ku her tişt bi axaftinê an jî bi gotinê derbasî nîfşan nabe, lewra tevger û çalakî jî di folklorê de bîbandor in. Ajotina erebeyekê her wiha pa-qijkirina diranan bêyî gotinê, bi dîtin û tecrûbeyan derbasî nava gel dibe. Her wiha li gor Dundes ji bo çêbûna folklorê pêdivî bi komên mezin jî nîne. Herî kêma du kes jî dikarin hêmanên folklorê ava bikin. Tiştên mihîm hevparîya di nava kom an kesayetên de ye. Loma jî ger em li ser karê hesîngeran rawestin em ê pêrgî folklorê hesîngeran bîn û hwd. in.²⁴ Bi vê fikra xwe Dundes hêmanên folklorê ji komên mezin ber bi komên piçûk ve kaş dike ku bi dîtinê wî herî kêma du kes jî dikarin folklorê ava bikin,

Li gor Sedat Veyis Örnek di diyarkirina naveroka folklorê de şaşîyên mezin tên kirin. Lewra raya giştî naveroka folklorê bi lîstikên gelan, stranên gelan û tiştên wekî wan qebûl dikin. Lê belê folklor bi lîstik û stranên nikare bê sînodarkirin. Hemû tiştên maddî û manewî yên aîdê gund, bajar an komekê ne, naveroka folklorê tijî dikin.²⁵

Îzzeddîn Mûstafa Resûl pênaseya folklorê û naveroka wê bi hev re îfade dike. Li gor Resûl her çend îro peyva folklorê di gelek alîyên kevneşopîya netewî de tê bikaranîn jî; ji tore, cil û bergên milî yên kevin, xwarin û vexwarin jî tê de, hemû berhemên çandî, weke folklorê tê pênasekirin.²⁶

Ertekin hêmanên folklorê mîna edebiyata gel bi nav dike û dibêje ‘Dengbêjî û stranên dengbêjiyê ji ruh û çanda gel dizên û parçeyekî muhîm ê edebiyata gel in’²⁷ Li gor Ertekin, her tiştên bi jiyana kesên re derbas dibin dikarin bibin mijara dengbêjan. ‘Evîn, bûyerên rojane, pîrsgirêkên sîyasî, welat, kuştin, talan, revandin, îxanet, girtin, xela, tofan, erdhej û wd.

Wekî ku xuya ye, ji ber mezinbûna qada wê ya xweser û sîwana wê ya berfireh tesbîtkirina sînorên folklorê zehmet dibe. “Zanista gel, hîkmeta awam, xelqîyat, folklor an zargotin... Ev peyvên han, di destpêkê de parçe parçe ji bo çanda gel, ayînên mîtolojîk, adetên parastî, jîyana ‘wehşîyên esîl’ mûzîk û reqsên gelêrî, biwêj, qewl, destan, efsane û çîrokan dihatin bikaranîn”²⁸. Jixwe lêkolînerên folklorê, di pênasekirina wê de bi giştî li ser zanistîbûna folklorê û têkilîya wê ya bi gel re li hev dikin. Lê di vir de pîrsa mihîm ew e ku, çanda gel li ser çi tê avakirin? Loma jî di van salên dawî de pênaseya folklorê hinekî din jî tê vekirin û wek ‘bîra civatê’ tê binavkirin. Dilawer Zeraq yek ji wan kesa ye ku folklorê bi awayekî giştî wekî ‘hişûbîra hevpar û ezmûna ku tê parvekirin’ îfade dike.²⁹ Bedran Hikmet jî folklorê wekî hîs û xeyalên hevbeş³⁰ pênase dike.

20 Francis Le Utley, “Folklorun Tanımı”, *Kovara Milli Folklor*, Wer. Saltık Özkan, s. 2005, h. 65, r. 135-136

21 Ayşenur Nazlı Özyurt, *Ziya Gökalp’ın Halk Bilimi Çalışmalarındaki Yeri*, Teza neçapbûyî, Ankara 2008, r. 72

22 Nail Tan, “Türkiye’de Halk Bilimi Çalışmalarının 100. Yılı Kutlarken”, *Kovara Folklor ve Edebiyat*, cilt: 19, h.75, 2013/3, r. 239

23 Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Folkloru*, Weşanxaneya Gerçek, Ankara, 1997, r. 9-10

24 Alan Dundes, “Folklor Nedir”, *Kovara Milli Folklor*, Wer. M. Öcal OĞUZ-Selcan GÜRÇAYIR, 2005, h. 65, r. 127

25 Sedat Veyis Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneya İş Bankası, Ankara 1977, r. 7

26 Ebubekir Gören, *Di Romanên Erebê Şemo De Folklorê Kurdî*, (Teza neçapbûyî), Mardin 2013, r. 2

27 M. Zahir Ertekin, “Du Deng û Yek Reng Di Kurdî De: Dengbêjî û Qesîdebêjî”, *Sempozîyuma Navnetewî ya Dengbêj û Çanda Dengbêjan*, 2019, r.620

28 Remezan Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman-*, Weşanxaneya Peywend, İstanbul 2013, r. 32.

29 Dilawer Zeraq, “Wek Mîrateya Neteweyî Folklor û Kovara Jinê”, *Kovara Zarema*, Diyarbakır 2016, h. 8, r. 59.

30 Bedran Hikmet, *Teorîyên Folklorê*, Weşanxaneya Lîs, Amed 2016, r. 8

Der barê tesbîtkirina naverok û sînore folklorê de gelek angaşt hene. Di kitêba “*Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*” de fikr û ramanên der heqê naveroka folklorê kurdî de hatine berhevkerin û encamek hatîye derxistin. Li gor vê kitêbê naveroka folklorê ji çar (4) beşan pêk tê:

1- Edebîyata Gelêrî

2- Adet û Tore

3- Bîr û Bawerîyên Gelêrî

4- Zanyarîyên Gelêrî³¹

Ango ew zanista ku li ser gel dixebite. Loma jî mijara folklorê gel e, hemû tiştên ku bi mirovan re têkildar in, di her dem û di her şertî de dikarin bibin mijara folklorê. Ji ber neqebûlkirina statîkbûnê, folklor bi dem û kesayetan re jî nikare bê sînordarkirin. Folklor tişteki zindî ye, bi mirovan re dijî û di avakirina kesayetan de jî roleke wê ya bibandor heye. Ango folklor dizê, digihîje û bi heyîneke domdar ji bo gel terxan dibe. Hemû tiştên maddî û manewî di vê babetê de cih digirin. Ji hemû motîfên çandî û netewî bigirin heta bi hemû afirîneriya gelan, wek folklorê pênasîkirin. Ji şahîyan bigirin heta şînan, ji xwarinan bigirin heta cil û bergan, ji lawayan bigirin heta nifiran, hemû tişt dikevin bin bask û qadên folklorê. Ji ber vê yekê jî divê em vê têgehê ji wateya wê ya bisînor veçirînin û wê bi wateya wê ya berfireh û rasteqîn binirxînin.

2. Têkilîya Folklor û Disîplînên Din

Folklor perçeyek ji jîyana mirovan e. Bo wê ye ku hemû zanistên bi jîyanê re eleqedar dibin, di heman demê de xwe digihînin folklorê wan jî. Li gorî Richard M. Dorson sehayên wek zimanzanî, erdnîgarî, muzîkolojî, civaknasî û heta derûnnasî jî bi folklorê ve pêwendîdar in.³² Ji ber ku her diçe folklor xwe adapteyê demê dike û li gor konjekturê xwe digihîjîne disîplînên din loma jî bi zanistên cure bi cure re jî di nav têkilîyeke xurt de ye.

Yuri Sokolov jî wek Dorson difikire û li ser ve zêde dike ku folklor tevî ku bi hunera devkî re eleqedar e di heman demê de bi hemû hunerên ku hatîne afirandin re jî di nav têkilîyê de ye. Hunerê wek şano, dawet, listik, stran, vegotina devkî û wd. in jî bi disîplîna folklorê re tên nirxandin.³³ Xebatên ku di kurdî de hatine kirin jî heman rêç domandine. Li gor kitêba ‘*Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*’ têkilîya folklorê bi dîrok, etnolojî, zimannasî, erdnîgarî, derûnnasî, civaknasî, hiqûq, şûnwarnasî (arkeolojî), pedagojî û bi edebîyatê re heye.³⁴ Loma jî xebatên ku bînan kirin divê ji nêrîneke giştî zêdetir, xwe bispêren kitekîtan. Ger em li ser mînakekê biçin, dema em li zimanê miletekî û bikaranîna wê binihêrin, em ê der barê jîyana wan de gelek agahîyan hîn bibin. Li ser meseleyê wextê di zimanê wan de peyvên di derheqê çîya, kevir, zinar, xweza û wd. in de zêde bin, em ê têbigihêjin ku jîyana wan nêzî çîyayan e. An jî di çîrokekê de leheng her dem li keştîyan siwar bibe em ê bizanibin ku erdnîgarîya wan nêzî behrê ye. Loma jî divê disîplîna antropolojîyê jî baş bê zanîn. Her wiha her tiştên ku wan afirandîye li gor disîplînên erdnîgarî, antropolojî, civaknasî û wd. in jî divê bê lêkolînkirin. Lewra bêtî fêhmîkirina sedemên derveyî û hûndirîn analîzkirina folklorê dibe ku negihîje armanca xwe.

Wekî em dizanin pêkhatiyên folklorê ne tenê mirov in; ligel vê axa herêmê, rewşa hewayî ya welatî, metal û dewlemendiya erdnîgarîyê û her wiha nebat û heywanên xwezayê jî di avakirina folklorê de roleke mezin dileyzîn. Ji ber ku ev tiştên rolên wan hene, ne qetî ne û bi demê re dikarin biguherin, em nikarin folklorê bi dem û kesayeta re sînordar bikin. Lewra dinya diguhere û pê re jî rewş û halê erdnîgarîya ku mirov tê de dijîn, diguhere. Loma jî em dikarin bibêjin ku folklorê jî wek mirovan, nebatan û ajalên zindî ye û av û xwarina wê jî binehişî û bawerîyên gel e. Atmosfera ku folklorê ava dike, ew atmosfer e ku kesayeta mirovan jî ava dike. Jixwe di xebatên folklorê de yek ji pîrsgirêk bi vê zindîbûnê re têkildar e. Lewra çawa ku jîyan her diçe xwe nû dike, folklorê jî diguhere û terz û teşeyên nû hildide, divê bi heman şiklî rê û rebazên folklorê jî xwe nû bikin. Ne ku bi pîvanên berê, divê bi pîvanên nûjen jî bê nirxandin. Çimkî folklor ne tenê gotin û edetên berê yên di paşxaneyê de ne. Wekî ku Sokolov jî destnîşan dike tevî ku folklor dengê rabirdûyê ye, ligel vê di heman demê

31 K.Yıldırım & R.Pertev & M.Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneya Avesta, İstanbul 2018, r. 31-32

32 Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê Îroyîn*, Wer. Necat Keskin, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2017, r. 31

33 Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Wer. Yerke Özer, Weşanxaneya Geleneksel, Ankara 2009, r. 14

34 Kadri Yıldırım / Ramazan Pertev / Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneya Zanîngeha Mêrdînê, İstanbul 2013, r. 32-38

de dengê berz ê îroyîn e jî.³⁵

2.1 Folklor û îdeolojî

Li gor Propp folklor dîsîplîneke îdeolojîk e.³⁶ Lê divê baş bê zanîn ku îdeolojîkbûna folklorê ne ku ji folklorê, ji atmosfera serdemê ava dibe³⁷. Propp di avakirina folklorê de balê dikişîne fonksîyona konjoktorîya civatê. Lewre nixê civata statîk nîn in û bi demê re û bi tecrubeyan re diguherin. Lê di vir de tiştêkî mihîm heye, ew jî neguherbûna koka folklorê ye. Li ser mînakê di çîrokekê de ‘revandin’ heye. Ev ‘revandin’ naguhere, kes dîsa tî ‘revandin’. Lê vê carê sedema ‘revandinê’ diguhere. Kok heman dibîne û pê re jî tiştên nû tê de zêde dibin an jî kêmbin. Çawa ku Propp di berdewamîya wê de mînaka ejderhayan dide ku berê jin direvandin, niha jî ûrisan direvînin. Çinkû fikrên nijadî derketine holê û bandor li ser civatê jî kirine û di prosesa xwe de regekî nû hildane. Ji ber vê yekê jî folklor îdeolojîk e û beyî ku ji aliyê yêkî/ê ve bê guhertin ji aliyê hemû civatê ve tê guhertin.

Propp di vê mijarê de hêj pêş de diçe û folklorê aîdê çînen bîndestan dibîne.³⁸ Ev fikra hane ji bo xebatên folklorê asoyeke nû vekir. Lewra êdî xebatên ku dihatin kirin di deverêkê de asê nediman, hemû sînor hildidan û di nava hemû mirovahîyê de hevparîyek zêft dikirin. Lêkolîner, li deverên cûda li pey heman mijarê diketin. Bî vî awayî di navbera civatên ji hev gelek dûr de heman hîs û xeyal peyda dikirin. Yuri Sokolov jî bi heman rêçê dişopîne û pê de diçe, ew folklorê wekî îfadekirina nefret û hêrsa gundî û karkeran a li hember esîl û axayan dibîne³⁹. Li gor Sokolov di avakirina hêmanên folklorîk de ji serdestan zêdetir karker/gundî çalak in. Rûdanên bo dewletan/ serdestan/ aristokratîtan tu tiştêkî îfade nakin, berevajî wê ji bo gundîyan bandorên qerase pêk tînin. Her wiha Sokolov dema erk û armanca folklorê diyar dike yek jî peywira folklorê, bi hişyarkirina hestên netewperwerîyê di nava gel de îfade dike⁴⁰.

Bi giştî ev fikr û ramanên di derheqê erk û fonksîyona folklorê de bi rêya rabirdûyê û mirovahîyê ji nû ve li gor pergala xwe ava bikin tevgerîyane. Ji ber ku yên van rîtuêlan dikin hê jî gundî bûn, loma jî bi şoreşa Sovyetê re qîmeta gundîyan derkete pêş. Ne tenê Êrisat, Almanya jî yek ji wan neteweyan e ku bi vê polîtîkaya xwe bûye sedema gelek rûdanên xirab. Dewletên din ên wek Amerîka, Frense û netew-dewletên din jî bi haybûna girîngîya folklorê ve dest bi xebatên vî şiklî kirine û folklorê ji bo gihaştina meqsedên xwê yên etnîk wek amraz bikaranîne. Ji Hîtler bigire heta sovyeta Rusyayê jî di xebatên xwe yên folklorê de ev tişt kirine armanç.

2.2 Erkên Folklorê

Ramazan Pertev di tesbîtkirina erka folklorê de balê dikişîne ser dersdayîna çîrokan. Lewre çawa ku di hin çîrokan de xeletîyên şexsî tî ziman, her wiha em carnan rastî rexne û normên civakî jî tî. Ê di berdewamîya vê fikra xwe de çîrokên kurdî yên wek Şengê û Pengê, Kêz Xatûnê, Dîkîl Axa, Kejê, Keçelo, Fatfatîlok, Pîra Mirovaxer, Hutê Heftserî û hwd. wek minak dide⁴¹. Li gor Pertev di naveroka van çîrokan de şîretên civakê veşartî ne. Loma jî yek ji erka folklorê şîretkirina mirovan bi xwe ye.

Ahmet Aras di qada folklorê de giringîyê dide rola dengbêjan. Li gor Aras di navbera folklor û dîrokê de danûstandînek heye. Ji bo piştrastkirina têkilîya folklor û dîrokê jî kilamên dengbêjîyê çavkanîyên xurt in. Her wiha bi mînakên stranên amaje pê dike ku dengbêjîyê di heman demê de erka kitêbên dîrokî jî pêk anîye. Di derbarê vê meselê de Ahmet Aras wiha dibêje; “bûyerên ku di kilamên dengbêjan de hatine vegotin, ji sedî sed rast in. Mînaka vê yekê ya herî mezin jî şerê mala Êsivê Seydo ye. Aras dibêje piştî ku min guhdariya kilamê kir, ez li pey belgeyên fermî ketim. Hin belge ketin destê min de û min dît ku kilam û belge wek hev in. Di ser de hûrgilîyên kilamê zêdetir in. Heger hûn ji min bawer nakin, neviyên wan jî sax in, herin jê bipirsîn. Ew dikarin gotinên min piştrast bikin⁴². Wekî ku xuya dike Ahmet Aras di wê bawerîyê de ye ku em kilaman ku ev jî yek

35 Yuri Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Wer. Yürke Özer, Weşanxaneyê Geleneksel, s. 2009. r. 21

36 Vladimir Propp, *Folklor: Teori ve Tarih*, Wer. Necdet Hasgöl - Tolga Tanyel, Weşanên Avesta, İstanbul 1999, r. 9-10

37 H.b.r, r. 9-10

38 H.b.r, r. 12

39 Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê Îroyîn*, Wer. Necat Keskin, Weşanxaneyê Avesta, İstanbul, 2017, r. 118

40 Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Wer. Yürke Özer, Weşanxaneyê Geleneksel, Ankara 2009, r. 34

41 Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok, Destpêka Pedagojiya Kurdî*, Weşanên Doz, 2009 İstanbul, r.93

42 Tekin Çifçi, *Di Kilamên Evîni yê Dengbêjan De Temaya Jinê: Kilam û Jin*, Weşanxaneyê Nûbihar, s. 2014, r. 37

jî hêmanên folklorê ye, dikarin wek dokumanên dîrokî bihesîbînin.

Avdo Karataş di wê fikrê de ye ku folklor qeydkirina çanda devkî, şênber û razber a kurdî ye⁴³. Loma jî xizmetkarîya çanda niviskî ya kurdî dike. Wekî ku xuya dike Karataş ji aliyê sazîkirin û bilindkirina wêjeya niviskî ve li folklorê dinêre.

Willian Bascom jî ji bo diyarkirina erka folklorê, xebatên gelek kêrhatî kirîne û bi giştî çarçoveyek wiha xêz kirîye. Li gor Bascom çar peywîrên sereke yê folklorê hene.

Yekem peywîra folklorê, ji bo xweşderbaskirina demê ye.

Dûyem peywîra folklorê, tradîsyona çanda devkî xurt dike û metirsîya windabûna wan ji holê radike. Bi awayekî giştî folklor erka mamostetîyê tîne cih.

Sêyem peywîra folklorê, derbirîna hestên ku hatine çespanandin û tevgerên ji aliyê civatê ve hatine qedexekirin in.

Çarem erka folklorê, edet û toreyên civatê zindî dihêle, bîra civakê diparêze û wê vediguhezîne ji nîfşên nû re.⁴⁴

Bi van fikr û nêrînan jî eyan e ku folklor di gelek qadên jîyanê de xwedî erk û rolên girîng in. Loma jî divê bê zanîn ku erk û armanca folklorê ne tenê ji bo derbasbûyîna şevbihêrkan an jî aşkirina zarokan e. Bi saya vê têgehê jihev cudabûna neteweyan jî xwe dide der. Çinku folklor bi xwe re dikare neteweyek û li hemberî wê jî 'yê din' ava bike. Lewra civat raborîyê di serî de bo naskirina takekesîya xwe bi kar tîne⁴⁵. Jixwe ji ber vê taybetmendîya xwe ya lêkolînê folklorê, di sedsalê dawîn de ji bo armancên polîtîk wek amrazekê hatîye bikaranîn.

Der heqê erk û armanca folklorê de gelek angaş û nêrîn hene. Di vî warî de xebatên ku hatine kirin pîranî di bin hûkmê lêkolîner de mane. Loma jî fikr û pênaseyên ji hev gelek dûr û cîyawaz derketine meydanê. Ya rastî di heyamên berê de folklor wekî zanistekê nedihat qebûlkirin û bala gelên Ewropî jî zêde nedikişand. Lewre berê de xebatên gel wekî xebatên *nezan/karker/nebajarî* dihat qebûl kirin û qiymetê wê jî zêde nebû. Lê bi bilindbûna netew-dewletan û bi taybetî jî bi şoreşa Frensî re, bala zanyarên Ewropî bêhtir çû ser folklorê û di vê mijarê de xwe pêş xistin. 'Folklor wek beşeke zanyarî ji aliyê Ewropîyan ve ji bo lêkolînkirina gelên xwe hatiye afirandin⁴⁶. Jixwe yekemîn xebatên li ser folklorê li Ewropayê bi destê zanyarên wê derê derçûn. Di van xebatên destpêkê de folklor ji koka xwe ya kultûrî hat derxistin û ber bi sazîkirina netewetîyê ve hate kişandin. Her çiqas jî aliyê îcrakerê folklorê ve ev xisleta wê ya netewetîyê baş nedihat zanîn û wek kevneedetên ji bo geşkirina şevbihêrkan dihat bikaranîn jî piştî sedsala 19an jî aliyê zana û xwendeyan ve ev rol û ruhê wê yê neteweyî hate ferqîkirin û bo avakirina milletî hate bikaranîn.

Encam

Folklor, diyardeyeke dînamîk û pêşkeftî ye ku bandorê li çand û nasnameya civakê dike. Tevî ku folklor wekî hêmanek civakê xuya bike jî, di heman demê de ruhê neteweyê jî îfade dike û bikaranîn û bi cih girtina xwe ve hafîzeyê kolektîf, nîrx û nasnameya civakê jî ava dike.

Xaleke din a girîng a ku di gotarê de hatiye balkişandin ew e ku folklor çawa xwe bi guhertinê civakî û tîkiliyên cûrbecûr re diguncîne. Di vê çarçoveyê de tê xuyakirin ku folklor tevî rabirdûyê diparêze, di heman demê de roja me ya îroyîn jî dinirxîne û di navbera wan de pêwendîyeke ava dike. Tîkiliya wê ya bi modernîteyê re jî nîşan dide ku folklor wekî rengêkî zindî ya vegotina çandî hebûna xwe didomîne.

Wekî gotina dawî, folklor ne tenê ronîkirina rabirdûyeke çandî ye, ew şeweyek zindî ya vegotina çandî ye îroyîn e jî ku dikare xwe biguhezîne û bi dînamîkên civakî yê ku her gav diguherin re tîkildar e.

43 Avdo Karataş, "Folklor û Afirandina Çanda Niviskî" *Kovara The Journal Of Mezopotamian Studies, Zivistan*, s. 2017, r. 35

44 Metin Ekinci, *Halk Bilgisi Folklor Derleme ve İnceleme Yöntemleri*, Weşanxaneya Geleneksel, 2007, r. 125-126

45 Jan Assman, *Kültürel Bellek*, Wer. Ayşe Tekin, Weşanxaneya Ayrıntı, İstanbul 2018, r. 142

46 Avdo Karataş, "Folklor û Afirandina Çanda Niviskî", *Kovara The Journal Of Mezopotamian Studies, Zivistan*, s. 2017, r. 34

Çavkanî

- Alan Dundes, “Folklor Nedir”, *Kovara Milli Folklor*, Wer. Gülay AYDIN, 2005, h. 65, r. 127-129
- Alan Dundes, *Folklor Nedir; Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 2*, Wer. M. Öcal OĞUZ-Selcan GÜRÇAYIR, Weşanxaneyê Geleneksel, 2010, Ankara
- Avdo Karataş, “Folklor û Afirandina Çanda Niviskî”, *Kovara The Journal of Mezopotamian Studies*, Zivistan, s. 2017, r. 33-52
- Ayşenur Nazlı Özyurt, *Ziya Gökalp'ın Halk Bilimi Çalışmalarındaki Yeri*, Teza neçapbûyî, Ankara 2008
- Bedran Hikmet, *Teoriyên Folklorê*, Weşanxaneyê Lis, Amed 2016
- Celadet Alî Bedirxan, “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê” *Kovara Hawar* j:1, Şam, 1923
- Celadet Alî Bedirxan, “Fehengok”, *Kovara Hawar* j. 30, Şam 1941
- Dilawer Zeraq, “Wek Mîrateya Neteweyî Folklor û Kovara Jînê”, *Kovara Zarema*, h. 8, Diyarbakir 2016
- Ebubekir Gören, *Di Romanên Erebe Şemo De Folklorê Kurdî*, (Teza neçapbûyî), Mardin 2013
- Francis Le Utley, “Folklorun Tanımı”, Wer. Saltık Özkan, *Kovara Milli Folklor*, s. 2005, h. 65, r. 130-136
- Jan Assman, *Kültürel Bellek*, Wer. Ayşe Tekin, Weşanxaneyê Ayrıntı, İstanbul 2018
- M. Zahir Ertekin, “Du Deng û Yek Reng Di Kurdî De: Dengbêjî û Qesîdebêjî”, *Sempozîyuma Navnetewî ya Dengbêjî û Çanda Dengbêjan*, 2019, r. 605-635
- Metin Ekinci, *Halk Bilgisi Folklor Derleme ve İnceleme Yöntemleri*, Weşanxaneyê Geleneksel, 2007
- Nail Tan, “Türkiye’de Halk Bilimi Çalışmalarının 100. Yılına Kutlarken”, *Kovara Folklor ve Edebiyat*, cilt: 19, h.75, 2013/3, r. 237-243
- Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Folkloru*, Weşanxaneyê Gerçek, Ankara, 1997
- Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanxaneyê Avesta, 2018, İstanbul
- Ramazan Pertev, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneyê Avesta, İstanbul 2018
- Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok, Destpêka Pedagojiya Kurdî*, Weşanên Doz, İstanbul 2009
- Remezhan Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman-*, Weşanxaneyê Peywend, İstanbul 2013
- Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê yên Îroyîn*, Wer. Necat Keskin, Weşanxaneyê Avesta, İstanbul, 2017
- Sedat Veyis Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneyê İş Bankası, Ankara 1977
- Süheyla Sarıtaş, “Halk Bilimine Giriş”,
www.acikders.org.tr/pluginfile.php/2512/mod_resource/content/2/Hafta_3.pdf, 13.12.2018
- Tekin Çifçi, *Di Kilamên Evîni Yê Dengbêjan De Temaya Jinê: Kilam û Jin*, Weşanxaneyê Nûbihar, s. 2014
- Vladimir Propp, *Folklor, Teori ve Tarih*, Wer. Necdet Hasgül - Tolga Tanyel, Weşanên Avesta, İstanbul 1999
- William Bascom, “Halkbilimi, Sözlü Sanat ve Kültür” Wer. Nilgün Aytuzlar, *Kovara Milli Folklor* s. 2004, h. 63, r. 86-97
- Yıldırım Kadri / Pertev Ramazan, / Aslan Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneyê Zanîngeha Mardin, İstanbul, 2013
- Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Wer. Yekke Özer, Weşanxaneyê Geleneksel, Ankara, 2009

Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî û Hin Taybetmendiye Wê¹

Kurte

Încîl, ji aliyê bawermendên xwe ve wekî metneke pîroz tê qebûl kirin. Bi vê taybetiya xwe hertim bûye bingeha mîsyona teblîxê ya belavker û herwiha ji mêj ve li gelek zimanên cihanê hatiye tercumekirin. Hin ziman cara ewil bi wergera Încîlê bûne zimanekî nivîskî û di hin zimanan de herçiqas berê berhemên menzûm hebin jî pexşanên pêşîn bi saya wergera metnên pîroz peyda bûne. Tradîsyon û pêvajoya pêşveçûnê ya wergerên Încîlê di her zimanekî de cuda ne û tevkarî, bandor, nîqaş û reaksiyonên curbicur li hemberî wan, mijarên hêjayî lêkolînê ne. Xeyn ji vê perspektîfa dîrokî û teolojîk, tê dîtin ku ji ber ku Încîl metneke bi-hecm e, di nav xwe de gelek malzemeyên zimanî dihevine. Ev taybetî dikare ji bo lêkolînên zimannasiyê jî bibe bingeh. Lewra dengnasî, hevoksazî, watesazî, ferhengnasî, wergernasî û gelek qadên din ên lînguîstîkê dikarin li ser metna behskirî usûlên xwe yê taybet tetbîq bikin. Ev xebat li ser wergera Încîlê ya ewil ya békêmasî hatiye kirin û hin taybetmendiye zimanî yê ku di nusxeya tam a sala 1872yan de tîn dîtin hatine nirxandin. Taybetiyên vê berhemê bêyî ku li gorî pîvanên îroyîn ên rêzimana standart bîn nirxandin, li gor dewr û konteksta xwe ya xusûsî hatine pêşkêşkirin. Xeyn ji vê yekê di derbarê naveroka berhemên din ên ku bi herfên ermenîkî hatine nivîsandin de û li ser mentiqê lîteratûra kurdî ya ku bi alfabeya ermenîkî hatiye saz kirin û li ser sedema pêwîstiya metnên bi vî şiklî agahî hatiye dayîn û şirove hatiye kirin.

Peyvên Sereke: Încîl, werger, kurmancî, alfabeya ermenî.

The First Gospel In Kurmanji Kurdish And Some Of Its Features

Abstract

As a text accepted as sacred by its believers, the New Testament has formed the basis of missionary expansion throughout history, and it has been translated into numerous languages. While some languages were first put into writing through Bible translations, some languages composed their first prose examples through these translations, though they had already produced poetry. The contributions and effects of translations, which have different courses in each language, and the various types of reactions to them are among the topics worth examining. Apart from this historical and theological perspective, it is observed that the Bible, being a voluminous text, contains many linguistic materials and enables linguistic research; phonology, syntax, semantics, lexicology, translation studies, and many other linguistic fields offer various approaches to the mentioned text within the framework of their own principles. In this study, the development of the Bible translations in Kurmanji was examined, and some linguistic features observed in

¹ Ev gotar bingeha xwe ji vê tezê digire: Sayım, İ. (2024). Yekemîn Încîla Kurdî Bi Alfabeya Ermenî, Transkripsiyon û Lêkolîn (Teza Doktorayê), Enstîtûya Zimanên Jindar, Bingöl, Türkiye. (This article is based on this thesis: Sayım, İ. (2024). The First Kurdish New Testament with Armenian Alphabet, Its Transcription and Analysis (Doctoral Dissertation) Institute of Living Languages, Bingöl, Türkiye.)



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year: 2024 • Cilt/Volume: 10 • Sayı/Issue:19

İlyas SAYIM

Xwendekarê Doktorayê
Zanîngeha Muş Alparslan
Ziman û Edebiyata Kurdî
i.sayim@alparslan.edu.tr
ORCID: 0000-0001-8606-0773

M. Zahir ERTEKİN

Prof. Dr. Zanîngeha Mardîn Artuklu
Beşa Ziman û Çanda Kurdî
zahirertekin@hotmail.com
ORCID: 0000-0003-3519-9892

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 02.01.2024

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 25.25.2024

Makale Yayın Tarihi / Published: 28.06.2024

DOI: 10.56491/buydd.1413575

Atıf / Citation:

SAYIM, İ. û ERTEKİN, M. Z. (2024). Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî û Hin Taybetmendiye Wê. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 10(19), 16-31

the complete translation of the New Testament (published in 1872) were revealed in its own period and context without adhering to today's standard grammatical rules. Apart from this, introductory information is given about the contents of other works written in Armenian letters, and the background of Kurdish literature created with the Armenian alphabet and its emergence as a necessity have been explained.

Keywords: New Testament, Translation, Kurmanji, Armenian Alphabet.

Încil'in İlk Kurmancî Tercümesi Ve Kimi Özellikleri

Özet

Încil, inananları tarafından mukaddes addedilen bir metin olması itibarıyla tarih boyunca yayılcı tebliğ misyonunun temelini oluşturmuş ve birçok dile tercüme edilegelmiştir. Bazı diller ilk kez Încil vasıtasıyla yazılı dil hüviyeti kazanmış, başka bazı diller ise manzum eserlerin varlığına mukabil nesir sahasına yine onun tavassutuyla geçmiştir. Her dilde ayrı bir seyri bulunan tercümeleme katkıları, tesirleri ve onlara dönük farklı türden reaksiyonlar incelemeye değer konular arasındadır. Bu tarihî ve teolojik perspektifin dışında Încil'in hacimli bir metin olması yönüyle de pek çok dil malzemesi barındırdığı ve dilbilimsel araştırmalara imkân sağladığı görülür; fonoloji, söz dizimi, semantik, leksikoloji, çeviribilim ve daha pek çok dilsel alan, kendi ilkeleri çerçevesinde ilgili metne dair farklı yaklaşımlar sunabilirler. Bu çalışmada Încil'in Kurmancî'deki gelişimi incelenmiş ve 1872 yılına ait olan eksiksiz tercümede gözlemlenen bazı dil özellikleri günümüz standart gramer kaidelerine bağlı kalınmaksızın, kendi devre ve konteksti içerisinde ortaya konulmuştur. Bunun dışında Ermeni harfli diğer eserlerin muhtevasına dair tanıtıcı mahiyette bilgiler verilmiş ve Ermeni alfabesiyle oluşturulan Kürtçe literatürün mantığı ve bunun neden bir ihtiyaç olarak ortaya çıktığı izah edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Încil, Tercüme, Kurmancî, Ermeni Alfabesi.

1. Destpêk

Încîl, Mizgînî yan Peymana Nû ji bo şopgerên doktrîna Îsa Mesîh metneke xwedayî û pîroz e. Kesên ku bawerîya xwe bi pîrozbahîya Încîlê anîne wek 'Îsewî, Mesîhî, Xaçparêz, Xaçperest, Xaçhebîn, Xirîstîyan' an jî di zimanê gel de wek "Fileh" tên binavkirin. Îro bawerîya Mesîhîtiyê yek ji mezintirîn dînen ser rûyê erdê ye û li gor hin statîstîkan hejmara xaçparêzan ji hejmara bawermendên din zêdetir e.

Miletê ermenî bi pîranî miletekî xaçparêz e û zimanê wan zimanê ermenîkî ye. Zimanê ermenîkî di nav xwe dibe du şax: Ermenîkiya rojhilatê û ermenîkiya rojavayê. Piştî ku *Krapar*, zimanê klasîk ê ermenîkî ji holê radibe zimanê rojane dibe zimanê nivîsê û ji ber dûrahiya erdnîgariyê û tîkiliya zimanên cîran, du cureyên axaftin û nivîsînê dertên meydanê. Di herdu zaravayan de jî heman alfabe tê emilandin, lê di xwendina wan de cudahiyeke mezin heye. Miletê ermenî xeyn ji zimanê xwe yê zikmakî zimanên din jî bi kar anîne û bi wan zimanan gelek berhem çêkirine ku tercumeyên Încîlê tenê qismek ji vê mîrata nivîskî ye.

Tekst û naveroka Încîlê ji bo fêrbûna jiyana Îsa Mesîh pir giring e û di nav xwe de xeyn ji agahiyên biyografîk gelek agahiyên olî û dîrokî jî dihewîne: Mûcizeyên Şandîyan ango Hewariyan (Arîkarên Îsa Mesîh), Nameyên Pavlus, Nameyên Giştî û xewna/pêşbîniya Yûhennayê beşên sereke yên Încîlê ne. Ji ber vê giringî û binge-hînbûnê ye ku hemû neteweyên xaçparêz xwestine ku Încîlê bi zimanê xwe yê dayikî bixwînin û di vê rêyê de gelek westiyane. Dewlet û rêxistinên xaçparêz jî ev armanc ji xwe re kirine mîsyon û di daîreya mîsyoneriyê de xebatên sîstematîk ên tercumeyê meşandine. Bi saya vê xebatkariyê ye ku îro herî kêr di hezar û pênc sed zimanan de² Încîlê tê xwendin û gelek ziman bi wergera Încîlê bûne xwedî alfabe û nivîsê an jî ji nezmê derbasî pexşanê bûne. Di Încîlê de behsa giringiya belavkirina peyama îlahî wiha tê tarîfkirin: *Û wî (Îsa) ji wan re got: «Herin her çar aliyên dinyayê û Mizgîniyê li hemû afirînê bidin bihistin. Yê ku baweriyê bîne û bê imadkirin (waftîzkirin) wê xilas bibe, lê yê ku baweriyê neyne wê sûcdar bê derxistin. Û ev nîşanên ha wê bi yên ku baweriyê tînin re bin: Bi navê min wê cinan derxin, wê bi zimanên nû bipeyivin, wê maran bi destê xwe bigirin û eger ew tiştên bi jehr jî vexwin, qet ziyanê nabînin. Ewê destê xwe deynin ser nexweşan û nexweş wê*

2 Ernst Wendland, Philip Noss, *Bible Translation*, Stellenbosch University, 2023, r. 5.

qenc bibin.»³

Di ayetên jorîn de amaje bi fêrkirina *Xebera Xweş* ango Mizgînîyê û peyivîna zimanên nû hatiye kirin. Tevî ku di vê kontekstê de ev yek wek keramet an bûyereke derasayî hatibe îfadekirin jî şopînerên xaçparêziyê ji bo belavkirina peyama Încîlê dest bi xebatên wergerê kirine û xwestine ku pirtûka wan a pîroz bigihîje hemû welatên dinyayê. Ji destpêka avabûna dewletên xaçparêz heta roja me ya îro wergêriyê dewam kiriye, lê ev pîşe û mîsyon bi taybetî di sedesala 19em û sedesala 20em de bi pêş ve çûye.

Zimanê kurdî jî ji tevgera giştî ya wergerê bêpar nemaye û metna Încîlê ji destpêka nîveka qirna 19em heta vê serdemê gelek caran hatiye tercumekirin.

1.1. Teorî û Rêbaza Xebatê

Ev xebat li ser tercumeya ewil ya bêkêmasî hatiye kirin ku qonaxa sêyem ya wergeran e ku pê helqeyên tercumeyê yên Peymana Nû tamam dibin. Pêşî çavkaniyên çapkirî hatine peydakirin û li gor rêza dîrokê di derbarê naveroka wan de û heta ku derfet çêbûye li ser nivîskarên wan agahî hatiye dayîn. Ji pirtûkên din ên bi tîpên ermenîkî jî (wek pirtûka ewil ya zarokan û helbestên/îlahiyên olî) ku derveyî mijara nusxeyên Încîlê ne, bi kurtasî behs hatiye kirin.

Mebesta sereke ya vê xebatê ev e ku li ser naveroka nusxeya bêkêmasî ya Încîlê raweste ku di sala 1872yê de li Stembolê hatiye çapkirin û çend cihetên wê yên lînguîstîk analîz bike. Di vê çarçoveyê de ji bineşaxên zimannasiyê wek fonolojî, semantîk, sentaks û leksîkolojîyê sûd hatiye wergirtin û ji metna orîjînal îqtîbas hatine dayîn.

Di transkrîpsiyonê de metoda W. M. Thackston hatiye şopandin ku ji aliyê usûla fonetîkê ve xwedî sistemeke hevgerî ye û dikare hemû dengên kurdiya kurmancî nîşan bide. Li pey tabloya alfabeya ermenîkî û muqabilên wê ya kurmancî çend tekstên nimûneyî ji Încîlê hatine parvekirin. Divê ku di pêvajoya tîpguhêziyê de adaptasyon, ango rastnivîseke modern neyê şopandin, lewre formên standardîzekirî nikarin bi teqezî nûneriya metnên dîrokî bikin ku bi alfabeke din hatine nivîsîn. Helbet rastnivîseke hevpar ku xwendina metnê hêsan dike tiştekî ne bêqîmet e lê ev yek ji bo xebatên zanistî zêde ne guncav e.

Du têgihên zimannasiyê hene ku di prosesa nixandina taybetmendiyên metnekê an zimanekî de roleke giring dilîzin: (i) *rêzimana tewsiyeker* û (ii) *rêzimana sêwirkar*. Di ya yekem de rêzimana zimanekî diyarkirî bi hemû beş û binebeşên xwe ve li gor rêzîknameyê kifşkirî tê tarîfkirin, lê di ya duyem de zimannas an vekolîner daneyan kom dike, li taybetmendiyên berbiçav mêze dike û di tesbîtkirin û qeydkirina wan de krîtera wî ji teoriyê zêdetir pratîka ziman e.⁴

Wekî ku Seyari û Aktaş jî di xebata xwe de îfade dikin “*di xebatên ku bi rêbaza zimannasiya şayesî (descriptive linguistic) û teknîka zimannasiya kargîn (functional linguistics) tê kirin de guherînên ziman ên dîrokî bi nêrîneke dîyakronîk nayên analîzkirin û bi nêrîneke rêzîkparêz (prescriptive) li ser rastbûn û şaşbûna taybetiyên ziman nixandînan nayên kirin.*”⁵

Kurdiya sedesala 19em helbet ji kurdiya îro cudatir e û ji ber vê yekê di metna mijara lêkolînê de usûla gramera şayesî hatiye şopandin.

1.2. Tesbîtkirina lîteraturê/çavkaniyên nivîskî

Bingeha vê xebatê nusxeya tam ya wergera Încîlê ye ku di sala 1872yê de çap bûye. Ev tercumeya bêkêmasî ku di nav xwe de hemû beşên Încîlê (bi tevahî 27 beş) dihewîne girêdayî metnên berî xwe ye. Ji ber vê yekê jî du çapên ewil ên berî wê jî bûne mijara vekolînê.

3 *Încîl Mizgînî*, Marqos 16: 15-18, Kitab-ı Mukaddes Şirketi, İstanbul, 2005, r. 109-110. (Peyvên ku di nav kevaneyan de hatine dayîn aîdî min in. Î. S.)

4 Eli Hinkel, *Descriptive versus Prescriptive Grammar*, TESOL Encyclopedia of English Language Teaching, Seattle Pacific University, r. 1.

5 Ahmet Seyari, Murat Aktaş, *Pêşgira Dariştinê ya ‘Ve-’yê û Fonksiyonên Wê yên Morfosemantîk di Berhemên Klasîk ên Kurmançîya Jorîn da*, Kurdiya, Jimar: 9, Mijdar 2023, r. 1.

Di pêvajoya lêgerîna çavkaniyên nivîskî ên bi tîpên ermenîkî de, pênc pirtûkên cuda jî hatine tesbîtîkirin ku her yek ji wan wek beşeke ji Încîlê hatine weşandin. Ev pirtûk piştî Încîla tam hatine weşandin û wergêrên wan jî hev cuda ne û bi vî awayî, ne berdewama wê ne. Ji ber ku her yek ji wan bi tena serê xwe dikarin bibin mijara xebateke berfireh û derveyî sînorên vê xebatê ne, di derbarê wan de agahiyên sînorkirî hatine dayîn.

Navên pirtûkên Încîlê yê çapkirî li gor rêzê wiha ne:

- 1- Încîlê Xodêê Me Îsa El Mesîhê, Nivisandin Bi Destê Madteos⁶
- 2- Încîl, Xodêê Me Îsa El Mesîhê, Nivisandin Bi Destê Madteos, Markos, Lukas û Hanna⁷
- 3- Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh⁸
- 4- Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Madteos Nvîsî⁹
- 5- Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Margos Nvîsî¹⁰
- 6- Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Xûgas Nvîsî¹¹
- 7- Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Xûgas Nvîsî¹²
- 8- ‘Emelê Resûla¹³

Xeyn ji van pirtûkan ku hemû wergerên Încîlê ne, pirtûkên din ên bi alfabe ermenîkî jî hene. Ev cure berhem jî bi xêra naverokên xwe yê tîpê û tîje dikarin bibin vekolînên serbixwe. Ji ber ku di pirtûkxaneyan de bi rehetî nedihatî peyda kirin di nixandina van berhemên jorîn de jî kopiyên dijîtal sîd hatiye wergirtin. Ji aliyê rûpelan ve di van kopiyên elektronîk de kêmasî tune bû û hemû metn bi zelalî dihatin xwendin. Di encamê de kêmasiya nusxeyên çapbûyî nebû sedema nuqsaniyeke şênber.

2.1. Tradîsyona Wergêriya Pirtûka Pîroz

Încîl jî bo wê pirtûka pîroz tê gotin ku wek Peymana Nû tê zanîn. Di vê binavkirinê de telmîhek heye ji gotina Hz. Îsa re ku di *Şîva Dawîn* de ji Hewariyên xwe re gotiye: *Gava wan (Hz. Îsa û Hewariyên wî) xwarin dixwar, Îsa nan hilda, şikir kir, ew şikand, da şagirtan û got: «Bigirin û bixwin, ev bedena min e». Piştî wî kasek hilda, şikir kir, da wan û got: «Hûn hemû ji vê vexwin. Çimkî ev xwîna min a Peymanê ye ku ji bo lêbihûrtina gunehan di ber gelean de tê rijandin.»*¹⁴

Peymana Kevn jî ew pirtûk e ku ji Tewratê dest pê dike û di nav xwe de wehyên din ên pêxemberên Benî Îsraîl (Zarokên Hz. Ye‘qûb) dihevine. Peyva peymanê di Tewratê de jî bo wê peymanê tê gotin ku di navbera Xwedê û Hz. Mûsa de hatiye danîn: *Û Mûsa derket hizûra Xwedê û Xudan (Rebb) jî çiya bangî wî kir û got: Tuyê ji mala Aqûp re wusa bibêje û tuyê ji lawên Îsraêl re bigehîne. We dîtî ku min çî ji Misiriyan re kirin û we çawa di bazîkê qertel de bar kirin [kişandim û ji xwe re anîm]. Û niha, ger hûn, bi rastî jî gotina min guhdarî bikin û bi peyman min bigirin, hûn ê ji min re, ji hemû neteweyên zêdetir û xastir bibin netewe, ji ber ku hemû dinya ya min e û hûn ji min re bibin qiraletiya kahînan û gelê pîroz. Gotinên ku tuyê ji lawên Îsraêl re bibêjî, ev in.*¹⁵

Ev herdu peyman bi hev re *Pirtûka Pîroz* an *Kitêba Muqeddes* teşkîl dikin. Divê ku dîroka wergerê ya van herdu pirtûkan di her zimanekî de cuda werin nixandin. Lewra metna Peymana Nû di hin zimanan de hatiye tercumekirin lê Peymana Kevn hêj bi temamî nehatiye wergerandin.

6 *Încîlê Xodêê Me Îsa El Mesîhê Nivisandin Bi Destê Madteos*, Çapxane: A. P. Çirçîl, Istambûl, 1856.

7 *Încîl Xodêê Me Îsa El Mesîhê Nivisandin Bi Destê Madteos Markos Lukas û Hanna*, Çapxane: Kayol, Istambûl, 1857.

8 *Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Isdambol, 1872.

9 *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Madteos Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol, 1891.

10 *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Margos Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol, 1911.

11 *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Xûgas Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol, 1911.

12 *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Hovhannes Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol, 1911.

13 *‘Emelê Resûla*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol, 1911.

14 *Încîl Mizgînî*, Metta 26: 26-28, r. 62. (Peyvên ku di nav kevaneyan de hatine dayîn aîdî min. Î.S.)

15 *Kitêba Pîroz*, Derketin 19: 3-6, Wergêr: Said Alpaslan (Seîdê Dewrêş), Resul Yıldırım (Resûlê Qereqoçanî), Komela Hêvî û Jîyanê, Biefeld, Germany, 2011, r. 133. (Di jêgirtinê de peyva Xudan wek XUDAN hatiye nivîsîn. Î. S.)

Herdu beşên Pirtûka Pîroz jî li kurdiya kurmancî hatine wergerkirin. Destpêka wergeran, geşedanên wan û qonaxên wan ên dawîn mijarên girîng in ku di her zimanekî de ev proses cihê ye. Bi gotineke din ji bo her zimanekî destpêk û berdewamiya wergeran çîrokeke cuda ye. Di zimanê kurdî de wergêriya Pirtûka Pîroz di sala 1856ê de bi Peymana Nû ango Încîlê û ji beşên Încîlê jî bi Beşa Madteosê dest pê kiriye. Temambûna wê tesadufî sala 1872yê dike. Peymana Kevn (Pênc Pirtûkên Hz. Mûsa, Pirtûkên Pêxemberan, Pirtûkên Dîrokî, Zebûra Hz. Dawûd û ên din; bi tevahî 39 beş) di demeke nêzik de, di sala 2004ê de hatiye temamkirin.

2.2. Wergerên Încîlê Ên Bi Alfabeya Ermenîkî

Di Încîlê de 27 heft beş hene. Di hin zimanan de bi temamî û di hin zimanan de tenê wergera qismekê hatiye kirin. Beşên Încîlê bi zaravayê kurmancî bi temamî hatine tercumekirin û sernavên wan bi rêzê wiha ne:¹⁶

- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Metta
- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Marqos
- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Lûqa
- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Yûhenna
- Karên Şandiyan
- Nameya Pawlos a ji Romayîyan re
- Nameya Pawlos a pêşî ji Korîntîyan re
- Nameya Pawlos a diduyan ji Korîntîyan re
- Nameya Pawlos a ji Galatîyan re
- Nameya Pawlos a ji Efesîyan re
- Nameya Pawlos a ji Filîpiyan re
- Nameya Pawlos a ji Kolosîyan re
- Nameya Pawlos a pêşî ji Selanîkiyan re
- Nameya Pawlos a diduyan ji Selanîkiyan re
- Nameya Pawlos a pêşî ji Tîmotêyos re
- Nameya Pawlos a diduyan ji Tîmotêyos re
- Nameya Pawlos a ji Tîtos re
- Nameya Pawlos a ji Filêmon re
- Nameya ji Îbraniyan re
- Nameya Aqûb
- Nameya Petrûs a pêşî
- Nameya Petrûs a diduyan
- Nameya Yûhenna ya pêşî
- Nameya Yûhenna ya diduyan
- Nameya Yûhenna ya sisiyan
- Nameya Cihûda
- Peyxama Yûhenna

16 Di rêzkirina beşan de di navbera mezhebên Ortodoks û Katolîkan de ferq hene lê ji aliyê naveroka hejmarê beşan ve cudahiyeke tune ye.

Di sala 1856ê de beşa yekem ya Încîlê li Stembolê bi navê ‘Încîlê Xodêê Me Îsa El Mesîhê, Nivisandin Bi Destê Madteos’ tê weşandin. Ev berhem di dîroka çapemeniyê de yekem pirtûka kurmancî ye ku hatiye çapkirin. Bi tevahî 112 rûpel e. Li ser berga pirtûkê an di berga hundurîn de di derbarê wergêrê wê de agahiyek tune ye. Agahiyên giring ên bi vê terzê encax ji raporên mîsyoneran, ji kovarên rêxistinên mîsyoner an jî ji belgeyên wek name, meqbûz, mezbete, nîşeyên taybet û hwd. tên peyda kirin.

Xweşbextane di çend çavkaniyan de navê wergêrê wê hatiye destnîşankirin. Li gor van agahiyan navê mutercimê wê Stepan e û ermeniyekî ji Hênêya Amedê ye.¹⁷ Stepan karê wergerê bi teşwîq û arikariya mîsyonerên amerîkayî pêk tîne û piştî ku metna wergerê ji tesdîqa mîsyonerê navdar ê rêxistina ABCFMyê (American Board of Commissioners For Foreign Missions) William Goodell derbas dibe, li Stembolê di çapxaneyê A. P. Çirçîlê¹⁸ de tê weşandin; hejmara kopiyên 3000 hezar e.¹⁹

Piştî salekê, di sala 1857ê de, dîsa bi destê rêxistina mîsyonparêz BFBS (The British and Foreign Bible Society) û bi xêra heman wergêrê çar beşên Încîlê ku wek Încîlên kanonîk (ên fermî û yasayî) tên zanîn li payitexta Dewleta Osmaniyê tê çapkirin. Vê carê çapxane ne çapxaneyê berê ye; xwediyê wê çapa Încîlê Kayol e (bi navê xwe yê tam Henri Caillol/Cayol ê Marsîlyayî ku digel eqrebeyê xwe Jacques Caillol li ser axa împaratoriye teknîka lîtoğrafîyê dane nasîn).²⁰ Pirtûk 398 rûpel e. Di vê çapa nû de hin şaşîtiyên çapa ewil hatine sererastkirin û li ser rastnivîsa hin peyvên jî guherîn çêbûye.

Piştî 15 salan di sala 1872yê de Încîl bi tevahî tê çapkirin. Vê carê rêxistina sponsor ABS (American Bible Society) bû û xwediyê metbeyê jî A. H. Boyaciyan bû ku di heman demê de serokatiya civata ermeniyên Stembolê dikir.²¹ Çapa ewil ya sala 1857ê ku çar beşên Încîlê di hewend dubare çap dibe û li serî jî 23 beşên mayîn tên zêdekirin. Ev, di dîroka kurdiya kurmancî de wergera ewil ya temam e. Pirtûk jî 627 rûpelan pêk tê û mezinahiya wê 19.5 × 13 sm. ye.

Di çavkaniyan de di derheqê wergêrê vê berhemê de ku 23 beşên mayî tercume kiriyê agahiyên gelek kêmhene. Navê wî Tamo ye (Tovmas) û wezîfeya wî dîyakozi ye (arîkariya keşîşî).²² Di prosesa wergerandinê de tefîş û edîtorî di destê mîsyonerê aktîf Isaac Grout Blissê (1822-1889) de ye. Bliss di nav 25 salan de ku li Dewleta Osmanî derbas kiribû karûbarên tercumeyê Pirtûka Pîroz îdare dibe û di vê muddetê de di 30 zimanan de salane 17000 heb kopiyên beşên Tewrat û Încîlê tên çapkirin û li çar aliyên împaratoriye tên belavkirin.²³

Bi van sê wergeran tercumeyê Încîlê bi dawî dibe. Di Încîlê de carinan uslûbeke helbestane hebe jî bi pexşanê hatiye nivîsîn²⁴ û bi temambûna wergera metna Peymana Nû nimûneyeke berfireh ya pexşanê jî derketiye meydana û ev yek jî perspektîfa zimanê nivîskî û dîroka ziman jî pir giring e. Tercumeyê duyem ya bêkêmasî encax piştî 129 salî, di sala 1988ê de hatiye weşandin.²⁵ Di vê navbera dûr û dirêj de helbet tercumegerî didome, lê tenê qîsmek jî Încîlê tê tercumekirin û çapkirin.

Yek ji wan tercumeyên parçeyî ku bi tîpên ermenîkî gihastiyê çapê di sala 1891ê de tê weşandin. Ev, beşa yekem ya Încîlê angî Încîla Madteosê, bi temamî wergera nû ye, yanî ne berdewam an dubareya tercumeyên berî xwe ye. Bi sponsoriya ABSyê li Stembolê çap dibe; navê çapkerê wê A. H. Boyaciyan e û jî 148 rûpelan pêk tê. Li ser bergê navê wergêr tunebe jî tê zanîn ku sê werger hene û navên wan wiha ne: Bedros Amîrxan-

17 M. Eric Nort, *The Book of a Thousand Tongues*, The American Bible Society New York, 1938, r. 200.

18 Navê çapxaneyan di heman demê de navên xwediyê çapxaneyan e jî. Wergêr Stepan navê çapxaneyê bi tîpên ermenîkî wek ‘A. P. Çirçîl’ nivîsiye, rastnivîsa wî yê bi tîpên Latînî ‘A. B. Churchill’ e. Navê vî yê tam Alfred Black Churchill (1825–1870) e û kurê çapxaneyanê navdar William Nosworthy Churchill (1796–1846) e.

19 Marcin Rzepka, *Konfesyjność przekładu Kulturowa historia kurdyjskich tłumaczeń Biblii*, Uniwersytet Papieski Jana Pawła II w Krakowie Wydawnictwo Naukowe, Kraków 2013, r. 146.

20 Cebe Ayaydın, Özlem Günül, *19. Yüzyılda Osmanlı Toplumı Ve Basılı Türkçe Edebiyat: Etkileşimler, Değişimler, Çeşitlilik*, Doktora Tezi, Türk Edebiyatı Bölümü Bilkent Üniversitesi, Ankara, 2009, r. 148.

21 Rzepka, b.n., r. 149.

22 Kenneth J. Thomas, *BIBLE viii. Translations into other Modern Iranian Languages*, The Encyclopaedia Iranica.

23 Rzepka, b.n., r. 149.

24 Floyd V. Filson, *How Much of the New Testament Is Poetry?*, McCormick Theological Seminary, Journal of Biblical Literature, Vol. 67, No. 2, Jun., 1948, r. 125-126.

25 *Peymana Nû Mizginiya Îsa Mesih (Încil), Bî Kurdi (Devok A Kurmancî)*, Wer: Seidê Dewrêş, Resûlê Qereqoçani, Gute Botschaft Verlag, 1998, Dillenburg, Germany.

yan, X. Der Xazaryan û Kavîne Aflakadyan. Ev her sê wergêr jî peywirdarên dêrê ne û tercumeya sparîşkirî di bin kontrola James Barton, sekreterê ABCFMyê kuta dibe.²⁶ Di rastnivîsa vê wergerê de û di yên de ku li pey wê peyderpey hatine çapê, sistemeke kamiltir tê bikaranîn ku ji aliyê nûneriya dengên kurdî û çareserkirina aloziyên xwendinê ve serkeftîtir e.

Pirtûka duyem ya vê silsileyê, Încîla Margosê, bîst sal paşê, di sala 1911yê de tê çapkirin. Pirtûk bi tevahî 87 rûpel e. Di heman salê de beşên din ên Încîlê tîr çapkirin ku bi rêzê wiha ne: Încîla Xugasê (148 rûpel), Încîla Hovhannesê (109 rûpel), ‘Emelê Resûla (138 rûpel). Hemû pirtûkên vê silsileyê ku di sala 1891ê de bi beşa Madteosê dest pê dîke û di sala 1911yê bi ‘Emelê Resûla diqede û bi tevahî di nav xwe de 5 berg in, li Stembolê hatine çapkirin û çapxaneyê wan (li ser bergê *basmaxane* derbas dibe) aidî A. H. Boyacyan (di îmlaya orjînal de Boyacyan) e. Wisa xuya dîke ku rêxistina arîkar xwestiye ku temamê Peymana Nû bi destê van her sê wergêran bide temamkirin lê ev proje nîvco maye.

3. Pirtûkên Din ên bi Tîpên Ermenîkî

Xeyn ji wan pirtûkên jorîn ku behsa wan hatiye kirin çend berhemên din jî hene ku bi alfabe ya ermenîkî û bi zimanê kurdiya kurmancî hatine çapkirin. Ev cure berhem bi wesfên xwe yên pêşengî²⁷ û bi vekirina asoyên nû di dîroka nivîskî ya kurmancî de cihekî giring dadigirin.

Pirtûka ewil ku ne wergera Încîlê ye “Alîfbecuz” e ku bi du zimanan, bi ermenîkî û kurdî û digel wêneyên balkêş ji bo fêrkirina alfabe yê, hejmaran, navên ajelan, duayên dînî, agahiyên dîrokî, neteweyî û hwd. hatiye hazirkirin. Navê wê yê tam wiha ye: ‘Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren, Alîfbecuz Kurmancî û Armenî’. Nivîskarê wê Migirdîç Dîkranyan e ku li ser bergê wek rêberê rûhanî yê herêma Kurdistan û Paloyê tê danasîn. Di bin agahiyên kunyeyê de hevokerê bi ermenîkiya rojavayê jî hatiye nivîsîn: “*Mirov ji heywanan bi ilmê xwe û bi qabiliyeta xwe ya afirandinê tê cihêkirin.*” Pirtûk di sala 1860î de li Xalatîa, Gostantnubolisê (Galata, Stembol), di çapxaneyê H. Mühendîsyân de hatiye çapkirin.²⁸ Heman pirtûk piştî salekê digihîje çapa duyem jî.²⁹

Di vê pirtûkê de tiştê enteresan ew e ku zimanê kurdî wek zimanekî navgînî hatiye bikaranîn da ku zarokên ermenî ku zimanê xwe yê neteweyî nizanin fêrî wî bibin. Ji ber vê çendê ye ku heman metn berê bi kurdî, piştê jî bi ermenîkî hatiye pêşkêşkirin. Di pêşgotinê de ku sernavê wê wek ‘Almat’ (malat < millet) derbas dibe, mebestên pirtûkê wiha hatine ravekirin: “*1. Vê elîfbacuz, hat çêkirin, bi rêyê kurt û kin ji boyê xelkê Kurdistanê qewmê ermenî. 2. Loma pêş me danî bi rêz luxetan bi izmanê Kurmancî, û paşê li ber wan bi izmanê Ermenî, ku çaxê xwandinê zaroyan yek car izmanê ermenî jî hîn bibin. 3. Û ji boyê dilê zaroyan şazkirinê her çî ku sûret bin destê me hazir hebû, her yekî cîyê xwe de me danî. 4. Nîhayet her çî ku ji destê me dihat ji boyê zaro re ilmê xwandin şîrin xuyayîkirinê me kir. 5. Û li pişt Elîfba jî, ji hemî pêştir lazim bû neqlîyatek ji boyê hînbûna zaroyan me danî. 6. Hîvîya me hene ku ji vê pê ve, herke xeyretek xuyayî bibe, ji wê gelek qencî re dest dibe bavêjim xuyayî kirin.*”³⁰

Pirtûka din ya bi tîpên ermenîkî “Tasakîrkê Kurmancî” ye. Peyva ‘tasakîrk’ê bi wateya kitêba dersê ye. Pirtûk di sala 1868ê de li Nor Yorkê (New York) di çapxaneyê ‘Amerîgatsî Dedragî Ingerutyan’ de hatiye çapkirin.³¹ Di derbarê nivîskarê/a wê de qeydek xuya nabe. Hejmara rûpelan 44 e. Naveroka wê pedagojîk e û bi danasîna tîp û peyvên fêrî xwendina zimanê kurmancî dîke. Wek pirtûka Alîfbacuz wê jî çend peyvên kurdî digel muqabilên wan ên ermenîkî rêz kirine. Ji vir tê têgihîştin ku yek ji armancên pirtûkê ew e ku dixwaze bi wasîteya kurmancî fêrî zimanê ermenîkî bike. Piştî egzersîzên herf û kîteyan metn tîr. Di metnan de li gor ola Xirîstîyanîyê şîret û pend tîr dîtin. Teksteke nimûneyî jî vê berhemê wiha ye: “*Hemû zarok gunehkar in; zehf gunehê*

26 Rzepka, b.n., r. 153-154.

27 Mesûd Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*, Peywend, Stenbol, 2015, r. 207.

28 Migirdîç Dîkranyan, *Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alîfbecuz Kurmancî û Armenî*, Gostantnubolis, 1860, r. 1.

29 Hasmik Stepanyan, *Hayeri Bîtîsum Yev Hayadarr Krderen Dzerragir u Dpagir Grakanutyuni, The Countries and Peoples of the Near And Middle East*, 2018, r. 237.

30 Dîkranyan, b. n., r. 2. (Ji ber ku ev jêgirtî tenê ji bo danasînê ye di transkripsiyonê de bi mebesta hêsankirina xwendinê rastnivîsa modern hatiye tercîhkirin. Î.S.)

31 *Tasakîrkê Kurmancî*, Amerîgatsî Dedragî Ingerutyan, Nor York, 1868.

te jî heye; wekî usa ye her êvar û her sibe dua bike, ko Hîsus gunehê te ef bike. Dilê te jî xirab e; dua bike ko Rûhê Paqij wî paqij bike û nû bike, ko gava ti bimirî herî ezman.”³²

Pirtûka dawîn ku dê behsa wê were kirin ‘Yerkaranê bi Kurmancî’ ye ku di sala 1880yê de li Xarpêtê hatiye çapkirin.³³ ‘Yerkaran’ bi maneya ‘pirtûka îlahîyan’ e. Di berhemê de xeyn ji pêşgotina bi sê zimanan (kurdî, ermenîkî û îngilîzî) 103 îlahî hene. Hejmara rûpelan digel rûpelên pêşgotinê û beşa dawîn ku sernavên îlahîyan dihewîne 115 e. Navê çapxaneyê ‘Kollêc’ e ku amaje bi koleja/mekteba dînî ya Xarpêtê dike. Xarpêt di nîveka sedsala 19em de dibe merkeza olî û ronakbîrî bo ermenîyan, bi taybetî jî bo ermeniyên herêma Serhedê.³⁴

Straneke olî ya vê pirtûkê wiha ye:

“Were Şahê Bi Qewet

Were Şahê bi qewet,

Navê te î bi izet

Em hemd bidin;

Tu ku li her cî Reb î,

Dayîm ferehçî dibî,

Em reca dikin.”³⁵

4. Hin Taybetmendiye Wergera Tam ya Sala 1872yê

Çawa ku berê hatiye gotin di nav çapên wergerên Încîlê de wergera tam ya sala 1872yê cihêkî xusûsî digire. Ev xusûsiyet ji ber temambûna metna wergerê pêk tê ku di nav xwe de materyalên dewlemend ên zimanî dihewîne. Ev materyal alîkî ve bi qaydeyên rêzimanê re, alîkî ve jî bi binebeşên lînguîstîkî re girêdayî ne. Bi gotineke din metna wergerê ku hejmara ayetên wê nêzikî 8000 hezar in, bi hemû hevok û peyvên xwe ve dikare bibe mijara vekolînê gramerê û li gor usûlên modern ên zimannasiyê were nixandîn.

Çend taybetiyên fîzîkî ên pirtûkê wiha ne: Metn bi tevahî 624 rûpel e û digel tabloya xeletî û rastiyan hejmara rûpelên wê dibe 627. Di pirtûkên serdema Osmanî de tabloya rastî û xeletiyên bi tirkî wek ‘hata-savâb cedvelî’ dihat binavkirin û di dawîya pirtûkê de mîna zeyl (pêvek) dihat weşandin. Di vê pirtûkê de jî bi sernavê “Xêledî”yê şaşîtiyên metnê û formên wan ên rast hatine nîşandan.

Di rûpelên metnê de zêde valahî nayê dîtin û li ser her rûpeleke tije herî zêde 33 riste hene. Mezinahiya wê 19.5 × 13 sm. ye ku bi vê taybetmendiya xwe jî pirtûkên mezin tê hesibandîn.

4.1. Hin Taybetmendiye Rastnivîsê Yê Vê Berhemê

Wergera tam ya Peymana Nû bi alfabeya ermenîkî ya rojavayê hatiye çapkirin. Her çend alfabe aidî zimanê ermenîkî bibe jî ziman kurdî ye. Ji ber hindê jî bo xwendina wê divê him alfabeya ermenîkî û him jî zimanê kurdî bê zanîn. Wek hemû alfabeyên adaptekirî alfabeya ermenîkî ya kurdî jî ji bo temsîliyeta dengên hatiye nûjenkirin. Tîpên alfabeya ermenîkî ya kurdî bi rêzê wiha ne:

32 B. n., r. 25-26. (Di rastnivîsa latînî de çend guherînên biçûk hatine çêkirin. Î.S.)

33 *Yerkaranê Bi Kurmancî*, Çapxaneyê Kollêcê, Xarpêt, 1880.

34 Martin Rzepka, *Translation, Power and Domination: The Postcolonial Explorations of the Bible in the Kurdish Context*, “Palgrave Studies in Cultural Heritage and Conflict, Rediscovering Kurdistan’s Cultures and Identities, The Call of the Cricket”, Gewerbestrasse, Switzerland, 2017, r. 203.

35 *Yerkaranê Bi Kurmancî*, r. 1-2. (Di rastnivîsa latînî de çend guherînên biçûk hatine çêkirin. Î.S.)

Transkrîpsiyon (Muqabilên Herfên Ermenîkî B1 Latînî)

Ermenîkî		Kurdî	
Majuskul	Mînskul	Majuskul	Mînskul
Ա	u	A	a
Բ	p	Բ	p
Գ	q	Գ	k
Դ	η	T	t
Ե	ê	YE/Y	ye/y
Զ	q	Z	z
Է	ê	E/Ê	e/ê
Ը	p	I	i
Թ	թ	T	t
Ճ	đ	J	j
Ի	î	Î	î
Լ	l	L	l
Խ	խ	X	x
Ծ	đ	DZ	dz
Կ	k	G	g
Հ	h	Y	y
Ձ	ă	TS	ts
Ղ	η	Ճ	ǰ
Ճ	đ	C	c
Մ	ú	M	m
Յ	J	H/Y	h/y
Ն	û	N	n
Շ	z	Ş	ş
Ո	n	VO/WE	vo/we
Չ	z	Ç	ç
Պ	uj	B	b
Ջ	z	Ç	ç
Ռ	n	Ք	r
Ս	u	S	s
Վ	v	V/W	v/w
Տ	un	D	d
Ր	p	R	r
Յ	g	TS	ts
Բ	ı	V/W	v/w
Փ	ph	P	p
Զ	p	K	k
Օ	o	O	o
-	l	-	yev
Չ	q	Q	q
Մ	ü	E	e
Էօ	eo	Ö	ö
Ու	ni	U/Û	u/û
Իւ	hi	Ü	ü

Di alfabeya ermenîkî de 38 herf hene; xeyn ji wan herfan semboleke taybet heye ku tenê ji bo gihaneka ‘û’yê tê bikaranîn: ‘u’ (yev). Ev simbol di seranserê metnê de tenê yek car tê dîtîn. Ji bo dengê ‘u’ya kin û dirêj du herf bi hev re tên nîşandayîn: ‘o’ + ‘v’. Heman mentîqa rastnivîsê di zimanê yewnanî de jî tê dîtîn ku ji bo ‘u’yê du tîp tên nivîsin. Ji ber ku yewnanî baş dizanibû, çêkerê alfabeya ermenî Mesrob Maşdots (361-440) bi ihtîmaleke mezin ev kombînasyon ji wî zimanî girtiye. Ji bo dengên ‘ö’ û ‘ü’yê jî kombînasyon hene ku li gor rêzê wiha ne: e+o=ö, i+u=ü. Ev herdu deng tenê ji bo rastnivîsa peyvên biyanî ku ji tirkî/osmanî hatine girtin tên bikaranîn. Du herfên zêde ku ji bo kurdî hatine çêkirin ev in: ‘e’, û ‘q’.

Çawa ku alfabeya ermenîkî alfabeyeke serbixwe ye, wisa jî xalbendiyên ku di vî zimanî de tên şixulandin cuda ne.³⁶ Li jêrê xalbendiyên zimanê ermenîkî û wezîfeyên wan (ku di metna kurdî de jî bi heman şeweyê hatine bikaranîn) hatine şirovekirin:

: (xalecot): Ev simbol di dawiya hevokan de tê dîtîn û şûna xalê digire.

. (xal): Ev simbol ji bo hevokên pêreyî, berî îzahatê yan jî axaftina kesekî/ê tê bikaranîn û şûna bêhnokê an xalêbêhnokê digire.

^ (pirsnîşan): Ev simbol ji bo pirsîkirinê tê bikaranîn. Teqez ne lazim e ku li dawiyê bê danîtin; pirs li ser kîjan peyvê bibe li ser wê tê danîtin.

` (bêhnok): Ev simbol ji bo cudakirina hevokan an jî hevokên bê lêker tê bikaranîn. Şûna bêhnokê û xalebêhnokê digire.

, (bêhnok): Ev simbol ji bo cihêkirina peyv an hevokan tê bikaranîn.

’ (dabir): Ev simbol di zimanê ermenîkî de ji bo dengên jêkirî tê bikaranîn, lê di metna kurdî de ji bo dengê ‘eynê (ع) hatiye xebitandin. Di dirêjahiya metnê de tenê çend caran tê dîtîn.

’ (kirpandin): Ev simbol ji bo kirpandina peyv an dengdêrekê tê bikaranîn.

’ (baneşan): Ev simbol ji bo xitabkirinê tê bikaranîn.

4.2. Hin Taybetmendiye Sentaksê yê vê Berhemê

Sentaks an hevoksazî ew şûbeya zimannasiyê ye ku bi usûlên rêzandina hêmanên hevokê re elaqedar dibe. Di zimanekî mûeyyen de hevokek tenê li gor rêzîkên diyarkirî tê sazîkirin û bêyî şopandina wan qaydeyan çarçoveyêke mentîqî pêk nayê. Helbet zimanê kurdî jî ne derveyî vê taybetmendiye ye û nivîsa standart an axaftinê herêmî (devok) tev girêdayî sentaksê ne.

Gelek ziman di prosesa avakirina zimanê neteweyî de pêşî ji wergerê arîkarî dibînin³⁷ û di metnên wergerkirî de ji ber bandora zimanê jêderkî (source language) hin formên çewt, an çewt nebin jî seyr, tên dîtîn. Di dîroka nivîskî ya kurdiya kurmancî de jî metnên destpêkî werger in û dema ku mirov li hevoksaziyê mêze dike bi hêsanî bandora zimanê tirkî/osmanî dibîne. Ev mesele ji aliyekî ve bi wergêriyê re têkildar e û ji terefê din bi têgiha ‘kontakta zimanan’ re jî têkildar e. Zafer Açar vê fenomenê wiha tîne ziman: “*Îja, ji ber ku kontakta kurdî bi çend zimanan re ye, em guherîna di kurdî de eşkere dikarin bibînin. (...) Guherîn hem di deng û tîpên kurdî hem di peyv û ferhenga kurdî, hem di sazîkirina hevokan hem jî di wateyê de pêk hatiye.*”³⁸

Çend nimûyên hevoksaziyê ji wergera tam ya Încîlê û paralelbûna wê bi zimanê tirkî re wiha ne:

- “(...) li Beytelehmê û dora wî da bûn hemî *kuşêl* piçûkan...” (r. 6)³⁹

(Beytlehem’de ve çevresinde olan bütün küçük çocukları...)

- “*Û bi dîtîne aw cematan li çiyê rabû...*” (r. 10)

36 Dora Sakayan, *Western Armenian For the English-speaking World A Contrastive Approach*, Yerevan State University, 2021, r. 17.

37 Lirak Karjagdiu, Naser Mrasori, *The role of literary translation in the development and enrichment of national literature*, Journal of Language and Linguistic Studies, 17(4), 2332-2345, 2021, r. 2339-2340.

38 Zafer Açar, *Sosyolinguistik Hin Têgehên Serekî û Sheyên Xebatê Yê Vê Zanistê*, “Rêzegotarên Zimannasiya Kurdî, Destpêk û Têgehên Sereke”, Peywend, Van, 2022, r. 158.

39 Hejmarên rûpelan aîdî metna wergerê ya sala 1872an e.

(Ve o cemaatleri görmekte dağa çıktı...)

- “Îsa go jê ra, Erki dixwazî tekmîl bûn” (...) (r.49)

(İsa ona dedi: Eğer kemale ermek istiyorsan...)

- “(...) li ber Xodê mûmkûnê hemî tîştan heye.” (s. 49)

(Tanrı'nın önünde her şeyin mümkünü vardır.)

Helbet pêkan e ku hevşibînên bi vî terzî muheqqeq bi bandora tirkî yan zimanekî din neyên îzahkirin. Dibe ku di wergerê de hostatiya wergêr kême be an jî ji ber kêmaniya mînakên nivîskî ên berî xwe nikaribe bi uslûbeke herikbar û rûniştî binivîse. Lê ne hewceyê gotinê ye ku zimanê fermî bivênevê tesîreke mezin îcra dike li ser zimanên neteweyên din û sentaks jî ne derveyî wê peywendiyê ye. Eger dereceya wê danûstandinê ji sînoreke maqûl derbas bibe, li wir dejenere û pûçbûn dest pê dike û xetereya wendabûna ziman dertê holê.⁴⁰

4.3. Hin Taybetmendiye Morfolojîk yê û Berhemê

Morfolojî bi metodên çekirina peyvan, wezîfeya qertafan, kesandina lêkeran û bi hemû cureyên formên ziman re elaqedar e; berê ev têgih tenê di zanista jîndarnasiyê de dihat bikaranîn lê îro wek têgihêke muhim ya lînguîstîkê jî tê bikaranîn ku şaxeke serbixwe ye û li ser morfên (guherînen) şiklî ên hêmanên zimanekî radiweste.⁴¹

Di metna wergera tam ya Încîlê de gelek mînakên formsaziyê hene û gire (pêşgir û paşgir) qîsmeke muhim ên guherînen sûretan e. Li jêrê çend mînakên qertafan û fonksiyonên wan ên rêzimanê hatine nîşandan:

–oğ: Gireya dariştinê ye, ji lêkeran kirde çêdike; li ser koka dema borî ya kesê sêyem tê îlawekirin. Mînak: Ceribandoğ (kesê/a ku diceribîne), gotoğ (kesê/a ku dibêje), nihêroğ (kesê/a ku dinihêre), çûndoğ (kesê/a ku diçe).

–êt: Formeke veqetandekê ye ku ji bo pirjimariyê tê bikaranîn. Mînak: Xuşkêt vîa, rûhêt napakan, şagirdêt wî.

–ê: Forma kurt ya veqetandeka ‘-êt’ê ye. Mînak: “Xodê dikari ji kavirê[t] han weledê[t] Îbrahîm derxîne.”

–tir: Gireya kêşanê ye, ji bo berawirdê tê bikaranîn, bi wateya zêdebûnê ye. Mînak: Pêtir, zêdetir.

–îtî/tî: Gireya dariştinê ye, ji navdêran navdêrên razber çêdike. Mînak: Qancîtî, mecbûrîtî, zarûtî, dirûtî (durûtî), padişahîtî.

–cî: Gireya dariştinê ye, ji navdêran navdêr çêdike, amaje bi çêkerê dike. Ev qertaf bi eslê xwe ve tirkî ye: Mînak: Gümrügcî, xancî, şeraatcî.

4.4. Hin Taybetmendiye Leksîkolojîk yê û Berhemê

Leksîkolojî ew şaxa zimannasiyê ye ku li ser ‘leksîs’an ango peyvan dixebite û xweza, wate, dîrok û bikaranîna wan dinirxîne.⁴² Di metna wergerê ya tam de vokabulereke dewlemend û rengîn heye ku dikare bibe babeta xebateke xusûsî. Ji ber ku werger aidî metneke olî ye, tê de gelek leksîsên olî hene. Ji ber ku mîletê kurd mîletekî misilman e, pîrsa ‘termînolojiya dînî ya xaçparêziyê bi çi awayî hatiye îfadekirin’ tê bîra meriv. Wergêrên Încîlê di vê meseleya bîproblem de usûleke wiha şopandiye: Ji bo hin têgihan ji zimanê ermenîkî sût hatiyê wergirtin, hin têgih ji wergerên osmanî ku di nav xwe de gelek hêmanên erebî û farsî di hewîne hatine girtin û hin têgih jî bi derfetên zimanê kurdî hatine avakirin. Ji ber vê yekê ye ku di etîmolojîya peyvan de çêştdarî balê dikşîne.⁴³ Li jêrê çend peyvên nimûneyî û zimanên wan ên jêderkî hatine destnîşankirin:

Xodê (kurdî): Hêza mezin ê Teslîsê (sîstema îlahî ya Sê Xudayan ango Xwedayên Sisêyî). “Zira padişahîtîê Xodê bi sözan nin e, lê bi quwwet e.” (r. 398)

40 İlyas Sayim, *Hasköy Kurmancî Ağzının Bir Kısım Özellikleri*, “Muş, Tarih, Toplum, Siyaset ve Hafıza”, Pınar Yayınları, İstanbul, 2020, r. 258-259.

41 George Yule, *The Study of Language*, Cambridge University Press, Cambridge, 2001, r. 75.

42 Jesús Martínez del Castillo, *Semantics and Lexicology*, Almería, 2013, r. 8.

43 Marcin Rzepka, *Protestants among Kurds and some problems of translations of the Bible into Kurdish in the 19th century*, Orentala Chrystana Cracovensa 1, 2009, r. 92.

Rûhe'l-Quds (erebî): Hêza mezin ê din ji teslîsê. “Az wê, tahfil dikim bi av ji boyê toba; hama li pey mi hatox ji min taqatî e, û ez sole wî garandinê nahêjim, awê wê dê tahfil bike bi Rûh el quds û bi agir.” (r. 7)

Îsa (erebî): Hêza mezin ê tir ji Teslîsê. Navkî taybet e ku di zimanê ermenîkî de wek ‘Hîsus’ tê bilêvkirin. “Wê çaxê Îsa cematî berda, û li mal hat; şagirdê wî hatin li balê, û gon: Temsilê zîwanê zevîan ji me ra bihakîne.” (r. 34)

Kurê Meruv (kurdî): Leqeba Hz. Îsa ye. “Ji boy vî hûn jî hazir bibin, çima ko li wusan saatkî, ko hûn texmîn nakin Kurê meruv tê.” (r. 64)

dacar (ermenîkî): Perestîşgeh; Mabeda Hz. Suleyman, perestgeha mezin ya cihûyan. “Û çaxê ji qelebe ra go Îsa: Mi girtinê weka li ser diz hûn bi kêran û bi daran rabûn? Her ro li nav dacar da bi we ra diironîşdibûm û talîm dikiribûm û hûn mi negirtin.” (r. 72)

tahfil (erebî): Tehfil, vaftîz, şuştina zarûyan ji wê gunehê ku ji Hz. Adem derbasî ziryetê wî bûye. “Nua herin hemî mîlletan talîm bikin, û tahfil bikin wan bi navê Bav û Kur û Rûh el quds; ...” (r. 79)

bayram (tirkî): Cejn; di dîroka cihûyan de roja xilasbûnê ji qralê Misirê. “Û digotibûn, li vî bayram da nebe, ki li qawm da nebe ko welwelekî bibe.” (r. 119)

yerets (ermenîkî): Êxtiyar, rûsipî. “Û bîst û çar yeretsan û çar haywanan ketin û secde kirin ji Xodê ra, ko li ser taxtê rodine, bi gotinê: Amîn, Alelûia.” (r. 617)

Xeyn ji van hêmanên dînî di peyvên din de jî çêşdiyeke mezin ya etîmolojîk xuya dibe. Tê dîtin ku wergêrên Încîlê di bikaranîna peyvên biyanî de zêde dudilî nebûne û ew bi rehetî tevî metnê kirine. Dibe ku ev helwest karê tercumeyê ji wergêran re hêsantir kiribe, lê di xwendin û têgihîştina metnê de carinan dibe sedema alozî yan serwestnebûnê. Çend unsurên biyanî ku di metnê de derbas dibin wiha ne:

başlamîş kirin (tirkî): Dest pê kirin. “Û kînga ko aw çûn, Îsa başlamîş kir ji cevata ra gotinê ji boy Hanna.” (r. 26)

düşümîş bûn (tirkî): Fikirîn. “Û düşümîş mebin hûn li nav xo da bêjinê, erki bavê me Îbrahîm heye, ji we ra dibê, erki Xodê dikari ji kavirê han weledê Îbrahîm derxîne.”

kelb (erebî): Kûçik. “Û arzû dikir ko ji sufrayê aw zengîne hati ketin ji hûrikê nanan zikê xo tijî bike, û hem ji kelban dihatibûn û brînêt wî dalêstin.” (r. 186)

yemîş (tirkî): Mêwe. “A nwa ji toba ra layiq yemîş bînin.” (r. 8)

5. Metneke nimûneyî ji wergera tam ya Încîlê

Li jêrê metneke nimûneyî ji wergera tam ya Încîlê heye. Berî transkrîpsiyonê sûreta orjînal ya vê metnê hatiye berpêşkirin.

Tîpguhêziya metnê li gor rêbaza W. M. Thackston hatiye kirin. Di vê rêbazê de ji bo dengdarên bêhilm, ‘r’ya qelew û ji bo dengên ku ji erebî derbasî kurdî bûne binxêz hatiye bikaranîn.⁴⁴ Reqemên biçûk ên metnê hejmarên ayetan in.

Ev metn ji beşa şeşem ya Încîla Madteosê hatiye girtin⁴⁵ û yek ji giringtirîn duayên xaçparêziyê ye ku wekî ‘Duayê Rebê’ an ‘Bavê Me’ tê zanîn. Transkrîpsiyona wê bi alfabeya latînî ya kurdî wiha ye:

“¹⁰ Yâ bavê me ko li azûmanday, navê ta azîz bibe; padîşahîtiyê ta bê; meramê ta bibe, çawan ko li azûmanda, wusan jî li ser ardê. ¹¹ Nanê me hemû royan îro me ra bide.

¹² Û deynê me ji mera baxş bike, çawan ko em jî baxş dikin ji deyndaranê xo ra. ¹³ Û me li tercubeyê mebe, lê ji şerê xalas bike, çima ko êtaye padîşahîti û quwwet û hamd ebedil ebed; amîn.”

44 W. M. Thackston, -Kurmanji Kurdish- A Reference Grammar with Selected Readings, r. 1-4.

45 Peymanê No, 1872. r. 14.

10 Ե՛ս՝ պավէ մա՛ քօ լը աղիւմանտայ , նավէ դա աղիղ
պըպա՛ն . փատիշահիթիյէ դա պէ . մէրամէ դա պըպա՛ն ,
չավան քօ լը աղիւմանտա՝ վուսան ժի լը սէր արտէ :
11 Նանէ մա՛ հէմու ուոյան ի ու մա՛նա պըտա՛ն :
12 Ու տէյնէ մա՛ ժը մա՛նա պախշ պըքա՛ն՝ չավան քօ ա՛մ
13 ժի պախշ տըքըն ժը տէյնտարանէ խօուա : Ու մա՛ լը
թէրճուպէյէ մա՛ պա՛ն , լէ՛ ժը շա՛նէ խալաս պըքա՛ն , չըմա
քօ էդայա՛ն փատիշահիթի ու գուվլէթ ու համտ էպէտը
էպէտ . ամին :

Eger heman metn li gor rastnivîsa îro ji nû ve bê nivîsin dê wiha xuya bibe:

“¹⁰ *Ya bavê me ku li azuman da y[e], navê te ezîz bibe; padişahîtiya te bê; merama te bibe, çawan ku li azuman de, wusan jî li ser erdê.* ¹¹ *Nanê me hemû royan îro ji me re bide.*

¹² *Û deynê me ji me re bexş bike, çawan ku em jî bexş dikin ji deyndarên xwe re.* ¹³ *Û me li tecrubeyê nebe, lê ji şerê xelas bike, çima ku ya te ye padişahîti û quwwet û hemd ebedu 'l- ebed; amîn.”*

Lê belê li vir pirsgireka mudaxeleye dertê meydanê û reseniya metnê xerab dibe. Xeyn ji vê yekê gengaz e ku heman metn ji ber nêrinê cuda, bi şewazên cihê were latînzekirin. Ji hêla din, eger ev cure metn bi meqsedeke pragmatîk an populîst werin standardîzekirin û ji daîreya teng ya akademiyê derkevin, gelek kes dikarin ji wan xeberdar û sûdmend bibin. Bi gotineke din herçend xebatên akademîk pabendî bi metna resen û tîpgruheziyeke hûr bixwaze jî ji bo gihîştina girseyên mezin standardîzekirin, zelalkirin, kurtasîkirin an usûlên bi vî rengî ji faydeyê ne dûr in.

Encam

Berhemên kurdiya kurmancî yê bi alfabeya ermenîkî hêmanên giring ên ji dîroka nivîskî ya vî zimanî ne. Lê ji ber ku bi alfabeyeke kêmnas hatine çapkirin bandora wan sînordar maye û li ser wan, xebatên akademîk an derveyî akademiyê hebin jî zêde nehatine zanîn.

Xusûsiyeteke van berheman ew e ku yekemîn nimûneyên çapkirî ên zimanê kurdî ne û xeyn ji pirtûka ‘Yerkaranê bi Kurmancî’ tev bi pexşan hatine weşandin. Bi qewlekî din bi qasî ku hatiye tesbîtkirin pexşana zaravayê kurmancî bi wan dest pê kiriye û her ku çûye ji aliyê uslûb û vegotinê ve bi pêş ketine. Eger berhema ewil ya sala 1856an û berhema dawîn ya sala 1911an bi hev re werin berawirdkirin, ev rastî bi hêsanî dê were fêmkirin.

Alfabe, pêdivîyeke sosyolînguîstîk a neteweyan e. Ji ber şert û mercên wê demê ermenîyên kurdîaxiv ji bo cimeata xwe çî te’lif bibin çî werger, di wan de şaşitiyên rêzimanê hebin an tune bin, zêde bî xwendin an hîç neyên xwendin, di encamê de metnên kurdî saz kirine û ji bo ku bi hêsanî bigihîjin armancên xwe alfabeya xwe ya neteweyî bi kar anîne. Ji bo adaptasyonê jî alfabeya ermenîkî li gor taybetmendiye fonetîk ên zimanê kurdî guherandine. Bi kurtî, kêmjimareke xeyrî muslim ji qewet û pratîkbûna kurdî sûdmend bûye û bi vî zimanî baweriyên xwe û hestên xwe yê neteweyî anîne ziman.

Gelo bandora pirtûkên kurdî bi alfabeya ermenîkî li ser cimeata ermenî çî bû? Destpêkirina karê wergera Încîlê, berfêhkirina wan wergeran, temambûna wergera hemû beşan, çapkirina pirtûka dibistanê ji bo zarûyan, ji nû ve çapkirina wê, çêkirina stranên rûhanî (yerkaran) ji bo dêrê û ji nû ve çapbûna wê di sala 1938ê de li Sûriyeyê⁴⁶ û destpêkirina wergereke nû ya Încîlê ku bi temamî ji wergera ewil cuda ye, tev nîşan didin ku ban-

⁴⁶ X. Der Xazaryan, *Yerkêd Rûhanî Bi Zimanê Kurmancî*, Haleb, 1938. (Ev, pirtûka dawî ya bi alfabeya ermenîkî ye. Mixabin xeyn ji sê rûpelan di destê min de nusxeya wê ya çapkirî an dijîtal tune ye. Î. S.)

dora berhemên kurdî bi alfabeya ermenîkî bi tu awayî biçûk an bêqîmet nebû.

Di vê xebatê de danasîna van berhemên giranbiha hatiye kirin û bi taybet jî çend taybetmendiye wergera tam ya Încîlê bi navê 'Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh' hatine hilsengandin. Di dawîya xebatê de hat dîtin ku di nivîsîna peyvan de ji devokên Serhedê sûd hatiye wergirtin. Ji ber ku ji zimanekî din hatiye tercumekirin û hewceyî bi termînolojiya dînî çêbûye tê de peyvên biyanî gelek in. Uslûb ew çend ne herikbar e. Carina îfade ne zelal in an jî biqisûr in û ji ber wan têgihiştin dijwar dibe. Ji aliyê peyvan ve gelek dewlemend e û ev yek tenê bi serê xwe dikare bibe mijara xebateke berfireh.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku wergera Încîlê ya tam, metneke dîrokî ye û tê de çiqas kêmasî yan xeletî hebin jî di hindura xwe de materyalên dewlemend ên zimanî jî vedişêre û bi xusûsiyeta xwe ya pêşengî ji bo pexşan û wergera kurdî dikare bibe mijara gelek xebatan.

JÊDER

- __ (1856), *Încîlê Xodêê Me Îsa El Mesîhê Nivisandin Bi Destê Madteos*, Çapxane: A. P. Çirçîl, İstambûl.
- __ (1857), *Încîl Xodêê Me Îsa El Mesîhê Nivisandin Bi Destê Madteos Markos Lukas û Hanna*, Çapxane: Kayol, İstambûl.
- __ (1868), *Tasakîrkê Kurmancî, Amerîgatsî Dedragî Ingerutyayn, Nor York*.
- __ (1872), *Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh*, Çapxane: A. H. Boyacyan, İsdambol.
- __ (1891), *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Madteos Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.
- __ (1911) *'Emelê Resûla*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.
- __ (1911) *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Hovhannes Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.
- __ (1911) *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Margos Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.
- __ (1911) *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Xûgas Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.
- __ (1911), *Peymana Nû Mizgîniya Îsa Mesîh (Încîl), Bî Kurdi (Devok A Kurmancî), Wergêr: Seidê Dewrêş, Resûlê Qereqoçani, Gute Botschaft Verlag, Dillenburg, Germany*.
- __ (2005), *Încîl Mizgîni, Kitab-ı Mukaddes Şirketi, İstanbul*.
- __ (2011) *Kitêba Pîroz, Derketin 19: 3-6, Wergêr: Said Alpaslan (Seidê Dewrêş), Resul Yıldırım (Resûlê Qereqoçani), Komela Hêvi û Jiyane, Biefeld, Germany*.
- Açar, Zafer (2022), *Sosyolînguîstîk Hin Têgehên Serekî û Sehayên Xebatê Yên Vê Zanistê, Rêzegotarên Zimannasiya Kurdî, Destpêk û Têgehên Sereke, Peywend, Van*.
- Ayaydın, Cebe - Günül, Özlem (2009) *19. Yüzyılda Osmanlı Toplumı Ve Basılı Türkçe Edebiyat: Etkileşimler, Değişimler, Çeşitlilik, Doktora Tezi, Türk Edebiyatı Bölümü Bilkent Üniversitesi, Ankara*.
- del Castillo, Jesús Martínez (2013), *Semantics and Lexicology, Almeria*.
- Dikranyan Migirdiç (1860), *Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alifbecuz Kurmancî û Armenî, Gostantnubolîs*.
- Dikranyan Migirdiç (1861), *Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alifbecuz Kurmancî û Armenî, Gostantnubolîs*.
- Filson, Floyd V. (1948), *How Much of the New Testament Is Poetry?*, McCormick Theological Seminary, *Journal of Biblical Literature*, Vol. 67, No. 2, Jun.
- Hinkel, Eli (?), *Descriptive versus Prescriptive Grammar*, TESOL Encyclopedia of English Language Teaching, Seattle Pacific University.
- Karjagdiu, Lirak - Mrasori, Naser (2021), *The Role of Literary Translation in the Development and Enrichment of National Literature*, *Journal of Language and Linguistic Studies*, 17(4), 2332-2345.
- Nort, M. Eric (1938), *The Book of a Thousand Tongues*, The American Bible Society New York.
- Rzepka, Marcin (2009), *Protestants among Kurds and some problems of translations of the Bible into Kurdish in the 19th century*, *Orientalia Cracovensa 1*.
